Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1106 | 8-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

## Dinya wê ji pêşbiniya ku tê dîtin zûtir bê asta neyê jiyîn

Li gorî lêkolîneke nû hat weşandin, wê dinya ji ya ku dihate fikirîn zûtir bê rewşa lê neyê jiyîn. Di nav 250 mîlyon salan de, germahiya gerdûnî dê mirov jî di nav de ji bo mamik, pir zêde be.

Lêkolîna ku ji hêla tîmek lêkolînê ya navneteweyî ve hatî kirin, di kovara pispor a "Nature Geoscience" de hate weşandin.

Ki gorş pêşbîniya tîma lêkolînê di 250 mîlyon salan de hemû parzemîn dê di yek parzemîna super de bibin yek.

Li gorî modelên avhewayê yên ku ji aliyê lêkolînerên Brîtanî, Emerîkî, Çînî û Swîsreyî ve hatine ewqasî xurt bibin ku dinya pir germ bibe."

Lêkolîner bikaranîna modela avhewayê, germahiyên ku dê li parzemîna super ku dê 250 mîlyon sal şûnde çêbibe.

Jonathan Buzan diyar dike ku di dema çêbûna parzemîba super de, wek Pangea, bi qasî 175 mîlyon sal berê, her carê bi awayekî germahî pir zêde dibe.

Tîma lêkolînê diyar kir ku şert û mercên jeolojîk û erdnîgarî yên parzemîna super ku dê çêbibe dê bibe sedema zêdebûna asta karbondîoksîtê ya li atmosferê û ew jî rê li ber zêdebûna germahiyê



çêkirin, wê hingê rûyê erdê ew qas germ bibe ku êdî jiyan ji bo mamikan namîne û ew ê bigihêje sînorên xwe yên fîzyolojîk.

Li gorî nivîskarên lêkolînê, germahiya ji 40 pileyî ji bo demeke dirêj dikare bibe sedema mirina gelek cureyên mamikan. Her wiha tê têxmînkirin ku nem jî wê bandorê li stresa germê bike.

Li gorî Jonathan Buzan ji zanîngeha Bernê ku yek ji nivîskarên lêkolînê ye, heta niha dihat texmînkirin ku şert û mercên avhewayê yên bi vî rengî dê di nav çend milyar salan de li ser rûyê erdê pêk werin.

Lekolînvan diyar dikin ku guherîna gav bi gav avhewa ya ku niha tê dîtin dibe ku hin deverên cîhanê bê asta jiyan lê nemîne.

Bi vê re di destpêkê de hate fikirîn ku mamik dikarin li perçeyek gerstêrkê di dema germbûna zêde de jî jiyana xwe bidomînin. Lêbelê di demeke dirêj de, roj wekî hemû stêrkan biriqandina wê bidome û dinya herî dawî were asta ku jiyan lê nemîne. Jonathan Buzan dibêje: "Di çend mîlyar salan de, tîrêjên rojê dê veke.

Dîsa, ji ber ku perav ji hev dûr in, ne mimkûn e ku baran li hundirê wê bibare.

Bi giştî, lêkolîner texmîn dikin ku li ser parzemîba super tenê ji sedî 8 mamik wê bijîn. Kêmbûn û cudabûna gelan dê bibe sedema zêdebûna metirsiya tunebûnê.

Ji bo amatoran 250 mîlyon sal dibe ku wekî heta hetayê xuya bike. Lêbelê, Jonathan Buzan destnîşan dike ku mamikên pêşîn tenê 300 mîlyon sal berê li ser rûyê erdê hatine dîtin. Ger pêşbîniyên lêkolîneran rast derkevin, heyama ku mamik li ser rûyê erdê dijîn, tenê beşeke piçûk a 4,6 mîlyar salên dîroka gerstêrkê temsîl dike.

Jonathan Buzan diyar dike ku ev encam ji bo gerstêrkan jî derbasdar in û ji ber vê yekê ji bo lêkolînên li ser jiyana derveyî erdê jî bandorê dike: gerstêrkên din jî, heke jiyan di demek kurttir de ji ya ku tê texmîn kirin, ango di nav çend mîlyon salan de pêş bikeve îhtîmala dîtina şopên jiyanê kêm e.

## Dengbêjê qedir bilind Cemîl Horo

Cemîl Horo di hunera xwe de gelek stranên neteweyî dibêje û li ser gelek serok û serkirdeyên Şoreşa Kurdistanê stranên neteweyî û şoreşgerî distirê, beşdarî gelek festîval û şahiyên Newrozê dibe.

Di dîroka dengbêjiya kurd de gelek dengbêjên qedirşinas derketine holê, ked û xebatên pîroz dane. Dengbêj Cemîl Horo jî yek ji wan dengbêjan e ku li gorî hin çavkaniyên cuda di 10'ê adara 1934'an de li gundê Serîncekê yê navçeya Bilbilê ya Efrîna rojavayê Kurdistanê hatiye dinyayê. Cemîl Hora ji biçûkaniya xwe ve stran û kelaman dibêje û dibe yek ji dengbêj û hunermendê navdar ê Rojava û çar parçeyên Kurdistanê. Wekî her hunermend û dengbêjê Kurdistanê Cemîl Horo jî bi huner û dengbêjiya xwe nikare debara xwe bike û hin kar û xebatên din jî dike. Tê gotin ku dikaneke wî ya xeratiyê hebû û li taxa Şêx Meqsûda Helebê bi navê Qehweya Cemîl Horo ji xwe re qehwexaneyekê vedike û di roja me ya îro de jî ew qehwe li Şêx Meqsûd navdar e.

Cemîl Horo jî wekî her welatparêzekî kurd xwedî nêrîn û armanceke siyasî ye. Li aliyekî xebatên xwe yên hunerî dike, li aliyê din jî yek ji endamê Partiya Demokrata Kurdistan Sûriyeyê ye ku xebatên siyasî dimeşîne. Ji ber vê yekê gelek caran rastî girtin û lêdanê tê. Li gorî daneyan di sala 1958'an 80'ê rojî tê girtin.

Her wiha ji ber astengiyan Cemîl Horo neçar dibe ku demekê were li Tirkiyeyê bijî. Piştre jî berê xwe dide bajarê Zaxo yê başûrê Kurdistanê li wê derê bi cih dibe. Di sala 1970'yî de careke din vedigere rojavayê Kurdistanê, kar û xebata xwe ya hunerî didomîne. Hunermend Cemîl Horo di sala 1965'an de yekem kasêta xwe tomar dike. Li gel Mihemed Arifê Cizîrî, Seîd Yûsif û gelek hunermendên kurd stranan dibêje. Hin stranên dengbêj yên navdar ev in; Lo bavo, Memê Alan, Bejna



Rindê, Ehmed Axa, Li min li min û hwd.

Cemîl Horo di hunera xwe de gelek stranên neteweyî dibêje û li ser gelek serok û serkirdeyên Şoreşa Kurdistanê stranên neteweyî û şoreşgerî distirê, beşdarî gelek festîval û şahiyên Newrozê dibe.

Cemîl Horo di 19'ê îlona 1989'an de koça xwe ya dawî dike û di 20'ê îlonê de jî li Goristana Henan a Efrînê li cem nemir Nûrî Dêrsimî tê definkirin.

### Sudoku: Bersiv 17

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 4 | 2 | 3 | 9 | 6 | 1 | 8 | 5 |
| 3 | 1 | 6 | 8 | 7 | 5 | 9 | 4 | 2 |
| 5 | 9 | 8 | 4 | 1 | 2 | 3 | 7 | 6 |
| 1 | 8 | 7 | 2 | 3 | 9 | 6 | 5 | 4 |
| 4 | 5 | 3 | 7 | 6 | 1 | 2 | 9 | 8 |
| 2 | 6 | 9 | 5 | 4 | 8 | 7 | 3 | 1 |
| 9 | 2 | 5 | 6 | 8 | 3 | 4 | 1 | 7 |
| 6 | 7 | 1 | 9 | 5 | 4 | 8 | 2 | 3 |
| 8 | 3 | 4 | 1 | 2 | 7 | 5 | 6 | 9 |

### Sudoku:Pirs 18

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 6 | | | | | | | 3 |
| 8 | 3 | 4 | 5 | | 6 | | | |
| 2 | | 5 | | | 9 | | | |
| 7 | 8 | | | | 3 | | | |
| 6 | 2 | | | | | | 1 | 5 |
| | | | 8 | | | | 9 | 7 |
| | | | 9 | | | 6 | | 1 |
| | | | 2 | | 1 | 7 | 8 | 9 |
| 1 | | | | | | | 2 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Av di deravê wî de nayê berdan:**
- Mirov nikare pê re kar bike; hevaltî pê re nayê kirin; cira wî ne xweş e; mirov nikare xwe têkil bike.

**Barê wî risas e:**
- Bi heman wateyê.

**Bazar pê re nabe:**
- Bi heman wateyê.

**Bazara wî betal e:**
- Bi heman wateyê.

**Bazara pê re betal e:**
- Bi heman wateyê.

**Borê wî kûr e:**
- Kesên di bazara xwe û danûstandinên xwe de hişk bin ji bo wan tê gotin.

**Bûye agir:**
- Bi heman wateyê.

**Em dibêjin xalo dixeyide, em dibêjin apo dixeyide:**
- Ji bo kesê cirnexweş tê gotin.

Kî çav bi serê wî bikeve, wê serê **xwe bi heft rengan girê bide:**
- Ji bo mirovên cira wan ne xweş tê gotin.

**Li pêşiyê diçim gezok e, li pey diçim tîzok e:**
- Pê re nayê borandin; cira wî ne xweş e; hevaltî pê re nabe; ne yê baweriyê ye.

**Li pêşiyê diçim pê li pehniya min dike, li pey diçim pehîna diaveje min:**
- Bi heman wateyê.

**Lîzk pê re nabe:**
- Bi heman wateyê.

**Ne li êş e ne li bajêr e:**
- Xwe di ber tiştekî re nake; pê re naçe serî.

**Şûfxezal e, lê xirabmal e:**
- Pir bedew e, lê cira wê ne xweş e.

**Yan naçe aş, yan ku biçe wê li aşvan bixe:**
- Yan kar nake, yan ku kar bike, wê tiştekî xirab jî bike.

**LI SER QEHIR Û XEMGÎNIYÊ**

**Agir berda nava min:**
- Ez pir qehirîm; derd û kul ji min re çêbûn; ez pir xemgîn bûm.

Agir bi dilê min ket
- Bi heman wateyê.

**Agir ket dilê min:**
- Bi heman wateyê.

**Bi bihara xwe şa nebû:**
- Xweşiya wî, keyfa wî jê re neme.

**Bi ser hev de xumiha:**
- Pir qehirî; pir xemgîn bû.

**Çavên wî tijî bûn:**
- Pir xemgîn bû; hindik ma bigirî.

**Çavên wî şor bûn:**
- Bi heman wateyê.


**Çavên xwe şor kirin:**
- Giriya.

**Dilê min li ser şewitî:**
- Gunehê min pê hat; ez li ber ketim; ez bi nexweşiya wî, bi rewşa wî êşiyam.

**Dilê min pê şewitî**:
-Bi heman wateyê.

**Di reşê de ye:**
- Ketiye şînê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî




## Malbata Arîn Mîrkan Soza şopandina riya wê dan

Arîn Mîrkan li Kobanê dîrokeke nû ya berxwedanê xêz kir. Arîn Mîrkan di hemû qadên têkoşînê de her tim di eniyên pêş de cih digirt û ji bo hemû hevalên xwe çavkaniya coş û baweriyê bû.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1106 | 8-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ÊRIŞÊN DAGIRKERIYÊ DEWAMA KOMPLOYA NAVNETEWÎ YE

KCK'ê destnîşan kir ku bi têkoşîna li dijî komployê zanebûna azadiyê hîn zêdetir pêş ketiye û têkoşîna gelê Kurd bûye gerdûnî û got: "Êdî tişta ku ji vir û şûn de were kirin, şikandina tecrîda li Îmraliyê, pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û bi dawî kirina komploya navneteweyî ye."**R-3**




Herwiha êrişên dewleta Tirk a dagirker yên dijminane li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewamiya Komploya Navnetewî ye û hewl dide qeyranên xwe yên civakî, aborî û siyasî yên li Tirkiyeyê binixumîne û derxîne derve. Ji vê zêdetir her tim hewl dide dagirkeriya xwe rewa bike.

## Evîndara azadiyê û stêrka ragihandina azad Gurbetellî Ersoz



Şopdara rastiyê, jina azad û hezkera çiyayên Kurdistanê, Gurbetellî Ersoz di 32'saliya xwe de dilê xwe li ser çiyayên Kudistanê neqişand û bi destê PDK'ê hate şehîdxistin. Gurbetellî Ersoz ji bo her jineke azad û têkoşer bû pêşeng û sembol.**R-2**

## Amedekariyên demsala Zivistanê di nava dorpêçê de



Bi hatina demsala zivistanê re hikumeta Şamê her ku diçe dorpêça xwe li ser koçberên herêma Şehbayê girantir dike. Ev dorpêç bandora xwe li ser tavahî aliyên jiyanê dike û rê li ber zehmetiyên mezin vedike.**R-6**

## Komploya 9'ê Cotmehê pêvajoyeke girîng a şerê cîhanê yê sêyemîn e

Komploya Navneteweyî ku di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li dijî Tevgera Azadiyê, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz de hate kirin, 9'ê Cotmeha sala 1998'an dest pê kir û heta niha berdewam e. Lê bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê komplo negihişt armanca xwe.**R-5**



## Pêwîste ku dagirkeriya Tirk di dadgehên navnetewî de were dadgehkirin



Ev zêdeyî 5 salane ku li Efrînê ji milê dagirkerên tirk û çeteyên wê ve sûcên dij mirovî têne meşandin. Di serî de jin, zarok têne kuştin û xweza ser erd û bin erdê Efrînê tê talan kirin û li hemberî civakê qirkirineke çandî û fikrî tê meşandin. Herweha li ser axa Efrînê kampên mîtingeriyê têne ava kirin û penaberên sûrî yên ku tirkiyê wan bi darê zorê der bi der dike li wan kampan bi cih dike.**R-4**



Salvegera 25'an a komployê
Ahmed Aktaş R-4



Parastina axa Sûriyê peywirekî neteweyî û exlaqî ye
Idrîs Henan R-5


# Malbata Arîn Mîrkan Soza şopandina riya wê dan

Arîn Mîrkan li Kobanê dîrokeke nû ya berxwedanê xêz kir. Arîn Mîrkan di hemû qadên tekoşînê de her tim di eniyên pêş de cih digirt û ji bona hemû hevalên xwe çavkaniya coş û baweriyê bû.

**Zana Roj/ Şehba**

Terora DAIŞ'ê di 15 ê Îlona 2014 an de bi hevkariya faşîzma Tirkiyê êrîşî bajarê Kobanê kirin. Bi pilangeriyeke mezin ev êrîş hat dest pê kirin. Yekem car terora DAIŞ'ê bi êrîşkirina Kobanê re xwestin xwe li Rojava mayînde bikin. Di Kobanê de Berxwedaniyeke efsanewî li hember dijmin hat kirin. Gel û şervanên azadiyê di asta herî jor de û bi kîneke mezin tavahî êrîş û pilanên ku hatine danîn bi têkoşîneke mezin vale derxistin. Bi hezaran Şehîdên giran buha yên weke Arîn Mîrkan, Zozan û Barînan di oxira parastina Kobanê de Şehîd bûn. Herî dawî di dîroka 26 ê Kanûna 2014 an Kobanê bi berxwedana xort û keçên welatê agir û rojê ji bin destê çeteyan hat rizgar kirin û careke din ji tavahî cîhanê re hat îsbat kirin ku wê Rojava li ber xwe bide û ticaran jî li hemberî çete û dagirkeran serî natewîne.

Çalakiya Arîn Mîrkan erşê neyaran hejand û tirs û xofeke mezin kire dilê çete û dagirkeran. Keça bajarê zeytûnan bajarê Efrînê bi çalakiya xwe ya fedayî ji bona hemû jinên cîhanê bû sembol. Bi çalakiya xwe ya leheng ku dîroka 5 ê Cotmeha 2014 an pêkanî, di cîhanê de dengvedaneke dîrokî da û bû pêşenga jina şerker û fedayî. Têkildarî salvegera çalakiya fedayî ya Ş. Arîn Mîrkan, Dayîka Şehîd Wehîde Henan û birayê wê Beşar Gênç Xemîs ji rojnameya me re axivîn.




**'Arîn Mîrkan di zaroktiya xwe de mîna keçeke şoreş ger tevdigeriya.'**

Yadê Wehîde di destpêkê de behsa jiyan û zarokatiye Ş. Arîn kir û wiha got:"Arîn Mîrkan di sala 1992 an de li gundê Husê yê Girêdayî navçeya Mabata çavê xwe li dunyayê vekir û navê Ş. Dilara lê hate kirin.

Ez dayîka 11 zarokanim. Ş. Arîn zaroka herî biçûk bû di nava malbatê de. Di biçûkaniya xwe de xwedî sekin û helwesteke cuda bû. Di nava malbateke welatparêz de mezin bû. Her tim dema heval derbasî malê dibûn, dev ji her tiştî berdida û li hevalan guhadarî dikir. Sekneke wê wer hebû ku her tim meyla wê li ser şoreş û şoreşgertiyê bû".

**"Arîn digot wê rojek bê û ez ê tiştên gelek mezin bikim"**

Dayîka Wehîda anî ziman ku Ş. Arîn her tim di astên bilind de difikirî û wiha domand: "Ş. Arîn di aliyê xwendina xwe de pir serkeftî bû. Di xwendina xwe ya Amedeyî de ya herî serkeftî bû. Di aliyê jiyanê de û di nava malbatê û gund e gelek dihat hez kirin. Dema pêvajoya xwendinê de her tim behsa tiştên mezin dikir û ji min re digot wê rojek bê û ez ê tiştên gelek mezin bikin. Em dihizirîn ku wê derbasî zanîngehê bibe û bixwîne.




Lê hizrên wê berûvajî hizrên me bû. Ş. Arîn behsa tevlîbûna xwe ya ji bo Kurdistaneke azad dikir".

**" Arîn bi çalakiya xwe tijmin tar û mar kir"**

Dayîka Wehîda dest nîşan kir ku keça wê di nava PKK'ê de xeyalên xwe bi cih anîn û wiha domand: "Ş. Arîn di sala 2007 an de tevlî nava refên Gerîla bû. Bi tevlîbûna wê em gelek kêfxweş bûn û min keça xwe bi tilîliyan oxir kir. Ew xeyal û gavên mezin yên danîbû pêşiya xwe di nava PKK'ê de pêk anî. Dema şerê Kobanê de me bihîst ku Ş. Arîn cihê xwe di nava şer de digre. Her roj min lava dikir ku xwedê wê û rêhevalên wê biparêz e. Lê belê ji ber Ş. Arîn xwedî armancên mezin bû û mirineke ji rêzê qebûl nedikir. Hovîtiya dijmin qebûl nekir û di Kobanê de di dîroka 5'ê Cotmehê xwe kir topek ji agir û di nava dijmin de xwe teqand."

Dayîka Ş. Arîn di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Ş. Arîn ne şehîdê min tenê ye ez bi şehadeta wê gelek



serbilind û şanazim. Niha li ser şopa Ş. Arîn bi sedan Arîn tevlî nava refên şoreşê bûne û navê wê li xwe kirine. Di malbata me de piştî şehadeta Ş. Arîn 6 zarok bi navê Arînê hatine bi nav kirin".

**'Nameya Arîn Mîrkan'**

Birayê Arîn Beşar wiha behsa xwîşka xwe Arîn piştî tevlîbûnê dike:"Arîn piştî tevlîbûnê ji me re nameya xwe şand. Dema name şand di destpêkê de behsa rewşa xwe dike ku gelek kêfxweş e û rewşa wê baş e. Wê di nameya xwe de anîbû ser ziman ku bû ku di destpêkê de ew li Garê bû û piştre derbasî Gabarê bû û piştî wê jî ew derbasî Rojava bû û tevlî şerê Kobanê bû. Dema name hatiye Hikumeta Sûriye hat mala me û got kê ji we re rêkiriye, lê me bi awayekê derbas kir. Ew name ya yekemîn û ya dawiyê bû. Ji xwe piştî demekî agahiya çalakiya fedayî ya dîrokî ku a Arîn pêkanî hate ragihandin".

# Evîndara azadiyê û stêrka ragihandina azad Gurbetellî Ersoz

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Şopdara rastiyê, jina azad û hezkera çiyayên Kurdistanê, Gurbetellî Ersoz 32'saliya xwe de dilê xwe li ser çiyayên Kudistanê neqişand û bi destê PDK'ê hate şehîd xistin. Gurbetellî Ersoz ji bona her jineke azad û têkoşer bû pêşeng û sembol.**

Gurbetellî Ersoz, bi nasnavê Zeyneb Agir rojnamevan, têkoşer herwiha yek ji jinên azad û şopdara heqîqetê bû. Ew di 11'ê Tîrmha sala 1965'an de li gundê Akbolot yê girêdayî navçeya Balo yê li Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye. Ew yekem jin bû ku karê edîtortiya giştî di Rojnameya Ozur Gondem de kar dikir. Di salên 90'î de dewleta Trik a faşist li Bakurê kurdistanê di derheqê gelê kurd de komkujî û binçavkirin pêk tanîn. Gurbetellî Ersoz ji bo ragihandina heqîqeta faşîzma artêşa Tirk a ku li Bakur dikir, bû zimanê gelê bindest. Wê heqîqeta faşîzma dewleta Tirk a dagirker bi wêrekî û cegeriya xwe di rojnameya Ozgur Gondem de û ji raya giştî re radigehand. Lewma ji aliyê dewleta Tirk a qirker ve hate girtin. Piştî demek ji dîlgirtina wê, ji zindanên faşîzmê derdikeve û berê xwe didin çiyayên Kurdistanê yên azad. Zeyneb Agir di sala 1995'an de tevlî refên Gerîlayên azadiyê dibe. Li çiyayên Kurdistanê ew tevlî karê leşkerî dibe û parastina gelê kurd dike. Di heman demê de ew karê rojnamegeriyê berdewam dike. Ji ber lehengiya wê ew dibe pêşeng û çavkaniya coşê ji bona hemû rêhevalên xwe. Herwiha ji bo jinên xwedî vîn di warê ragihandina azad de, dibe rojnamegereke pêşeng. Mixabin kesên pêşeng her tim têne hedef girtin, ev tişteke herî zor e ji bo gelê kurd. Lê tişta zortir ew e ku kurdek ji aliyê hevkarê dagirkeriya Tirkiyê ve were şehîdxistin. Gurbetellî Ersoz di 8'ê Cotmeha sala 1997'an de bi destê PDK'ê li ser çiyayê Garê hat şehîdxistin. Ku berî wê jî Şehîd Bêrîtan( Gulnaz Kertaş) di 1992'an de bi sedema êrîşa Pêşmergeyên PDK'ê xwe ji serê zinarên bilind yên çiyayê Xakurkê avête xwarê û xwe radestî îxaneta malbata Berzanî nekir. Gurbetellî Ersoz jî mîna Bêrîtan û rêhevalên xwe yên din da ser şopa heqîqetê û navê xwe di rûpelên dîroka têkoşeran de tomar kir. Hêjayî gotinê ye ku Zeyneb Agir ji destpêka ku tevlî kar û xebata Gerîlayan bûye, roj bi roj kêliyên ku bi wê re derbasbûne di pirtûka xwe de belge kiriye û gelek bîranînên ku jiyan kirine di nava lênûsa xwe de nivîsîne. Wê bi destekî şer dikir û karê rojnamegeriyê dikir. Herwiha bi destê xwe yê din kêliyên xweş û bi keser dinîvsand. Piştre ev hemû bîranîn tev hatin komkirin û pirtûkek bi navê " Min dilê xwe li ser çiyayan neqişand hat çapkirin.

**Şoreş ji bo têkbirina astengiyan riya çareseriyê ye**

Gurbetellî Ersoz di pirtûka xwe de wiha dibêje:"Divê mirov kêlî bi kêlî û roj bi roja xwe jiyan bike, ji bo tê bighêje ku tişta herî zor li ser mirov ew e ku şoreşekê li dar bixe. Pêkane ku mirov xweşikbûnê biafrîne û wê di hundirê xwe de pêk bîne. Pêwîste em her tim li ser mijara azadî û kolektiyê rawestin. Min îro rêxistin hîn baştir nas kir, bi taybet dîtina min ji şerê fermandarê min re. Wî berxwedaniyek di çeperên şer de dikir, ev jî ji bo min tişta herî balkêş bû. Divê mirov çiya û welatê xwe bike heman tişt. Belê çiya û welat bandora xwe li ser mirov heye. Li vir li ser çiyê kesayeta mirov bi zelalî tê xuyakirin, hem hêza wî û hem jî bê hêzbûna wî jî eşkere dibe. Azadî bi wate dibe dema ku mirov hişmendiya xwe li pêş dixe û mejiyê xwe bi kar tîne. Vîn û evîndariya çiyê berî niha di dilê min de bû, lê min dît ku pêwîste dilê min li ser çiyê be û ev yek jî kirina şer û têkoşînê ye. Di



jîngeheke wisa gelek bedew de, şerê li dijî kirêtiyê gelekî zehmet e. Ev yek mîna vebûna kulîlkên Tolîb yên ku li ser latan vedibin e. Şerên mezin û berfireh mirov bihêz dike û ev yek li ser bedena min jî hat xuyakirin."

Naskirina Gurbetellî Ersoz, naskirina hemû jinanên azdîxwaz e

Di pêşgotina Pirtûka Şehîd Gurbetellî Ersoz de wiha hatibû gotin: " Naskirin û fêmkirina Şehîd Gurbetellî Ersoz naskirin û fêmkirina hemû jinên kurd e, ew jinên xwedî tecrûbe yên têkoşîna azadiyê dikin. Nivîsên Gurbetellî Ersoz ne tenê ji şexsê wê re bûn, bi wan gotinên xwe muxatebeya hemû mirovan dikir. Her tim li ser heqîqet û nirxên mirovahiyê diaxivî. Ew kurd perwerek bû, hewil dida ku derbirînên xwe di vî warî de li ser mijara netewî, hêvî û hêrsbûna xwe bi nivîseke xweş û sade li ser rûpelên pirtûka wê hatibûn nivîsandin. Di nav rûpelên nazik de gotibû: " Ew jina Kurd rêhevala min e, ew ê li vir heta dawiyê jiyan bike." Pêwîste ku mirov ramanên Şehîd Zeyneb nas bike û nivîsên wê bixwîne. Ji ber ku bi riya wan rastiyan Şoreşa Gerîla û Kurdistanê tê diyarkirin. Herwiha di rewşên zehmet û nehevsengî de, lehengî, berxwedanî, serkeftin li dijî hêza madî, aborî û teknelojiyayê derdikeve holê. Kesayeta Ş. Zeyneb ji bo jinên azad û xwedî fikrên pêşketî yên şoreş afrandin bû kesayeta jina pêşeng û resen. Ji ber ku wê destaneke lehengî li ser pêkanîna şoreşan û bidestxistina azadî, herwiha rizgarkirin û netewperweriyê nivîsandiye.



# Rewşenbîr û siyasetmedarê Kurd Nûredîn Zaza

Nûredîn Zaza di (15'ê sibata 1919'an li Madenê, Împeratoriya Osmanî- 7'ê çireypaşîn 1988 li Lozanê, Swîsra) ji dayik bûye. Ew kesayetekî ramyar, nivîskar, rewşenbîr, damezrêner û yekemîn serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê bû.


**Deriya Çiya/Qamişlo**

Dr.Nûreddîn Zaza di 15'ê Reşemî 1919'an de li bajarê Medenê -Tirkiyeyê ji dayîk bûye, dema ku ew biçûk bû tevî birayê xwe Dr. Ehmed Nafez ji Tirkiyê reviya û li Sûriyê penaber bû. Têkçûna şoreşa Şêx Seîd pîranî û Agriyê. Tirkiyê xwest ku welatparêzên kurd ji sînorên Sûriyê dûr bixe, ji ber vê yekê jî li ser daxwaza xwe Fransa ku wê demê Sûriyê kontrol dikir, ew li gel komek welatparêzên kurd der bi derî Şamê kir, Ji wan: Celadet û Kamran Bedraxan, Memdûh Selîm Bey, Hemze Maksî, Osman Sebrî... hwd, û li Şamê ji aliyê Elî Axa Zalfo Zaza, ku ji Kurdên Şamê bû, hatin pêşwazîkirin.

Nûredîn Zaza mirovekî welatparêz, dilsoz, çalak, ronakbîr û bawerî bi pir çandî û têgehên edalet, demokrasî û mafên mirovan e, jiyana xwe ji bo xizmeta doza Kurd terxan kiriye, di xizmetkirina civakê de roleke bi bandor lîstiye. Gelek çalakî li piraniya welatên ku lê niştecih bû pêk anî û li Şamê ew û hevalên xwe koma Kultûrî ya Kurdistanê bi serokatiya Xeyrî Zaza damezrand û Nûredîn Zaza bû sekreterê wê komê. Di sala 1944'an de çû başûrê Kurdistanê, lê li Mûsilê hat girtin û di girtîgehê de rastî işkenceyeke giran hat û piştî ku ji girtîgehê derket vegeriya Sûriyê. Ji ber vê yekê birayê wî ew razî kir ku ji bo xwendinê biçe Lubnanê, ji ber wê yekê ew çû Lubnanê û li zanîngeha Beyrûtê beşa Zanistên Siyasî û Darayî xwend û di wê demê de li Radyoya El-Şerq kar kir.

**Çalakî û xebatên Nûredîn Zaza**

Ew kujer û komkujyên mezin, ku dewleta tirk dijî gelê Kurd li Bakur û nemaze li Dêrsimê pêk tanî, Nûredîn di dil de têşîne. Û ew raporekê derbarî wan bûyerên xirab û hov dinivîse û dide pêşiya hevalên xwe ji xwendekarên dibistana fransawî li Şamê û çendek ji xwendekarê tara kurdan û diçin



radestî balyozxaneyên dewletên biyanî dikin.

Di sala 1937'an de, dîse jî bi serokatiya Nûredîn, civateke xwendekaran bi navê Hêvî li Şamê tê damezrandin. Civata Hêvî, rihê netewî di nav xwendekarên kurd de geş dike û pirsa gelê xwe bi rê ya balyozxaneyên derve ku li Şamê heyî, digihîne Lîga Neteweyan.

Di paşiya sala 1937'an de, Nûredîn Zaza û çend hevalên xwe, tîmeke fûtbolê bi navê Kurdistan li Şamê çêdikin. Tîma Kurdistan pir xweş dileyize û pêlewaniya Sûrî distîne. Nûredînê 20 salî, çalak û jêhatiyê di warê rojnamegeriyê de. Di nivîsên xwe de, ew tekez dike ser fêrkirina zimanê kurdî û di kovarên Hawar û Ronahî de berhemên wî hene. Mîr Celadet Bedirxan, çîrokên wî yên kurt bilind dinirxîne û wî weke Çexovê kurdan bi nav dike.

Bûyera kû di sala 1942'an de bi Nûredîn re di tirênê de qewimî bû (xwe ji tirênê avêtibû) û helwesta wî ya cesûr bi herdû mamosteyên tirk û cendirmeyan re, didin xuyanîn bê çiqas ew mirovekî zane û mêrxas bû. Nûredîn, her û her amade ye ku tiştekî ji miletê xwe yê kurd re bike. Gava jê re dibêjin: Em dikarin te bigihînin nik seydayê Barzanî û komela Hêwa, ew yekser qebûl dike, û dev ji mal û mewdanên xwe diqere û diçe. Lê mixabin, wan li ser sînorê Sûrî bi Iraqê re digirin û salekê Nûredîn di girtîgehên Mûsil, Emara û Bexdayê de girtî dimîne.

Li Bêrûdê, sala 1945'an de, dema ku Nûredîn Zaza xwendina xwe li zanîngiha fransawî dike, ew şûna Mîr Kamîran Bedirxan di Radyoya Libnanê - beşê kurdî de digire û bi karekî mezin di behiskirina pirsa kurdî û ragihandina xeber û nûçeyan ji her çar parçeyên Kurdistanê dirabe. Piştî ku hikûmeta Libnanê beşê kurdî di Radyoyê de digire, Nûredîn dibistanekê şevane ji bo fêrkirine kurdên Libnanê ji zimanê kurdî re vedike.

Di sal 1947'an de, Nûredîn Zaza pileya Lîsans di zanistên siyasî de ji Zanîngiha Fransayê li Bêrûdê distîne û berê xwe dide Swîsreyê da xwendina xwe ya bilind bidomînê.

Li Swisreyê, qonaxeke nû û girîng di jiyana Nûredîn Zaza de dest pê dike. Ew çûye wir da ku xwendina xwe temam bike, lê pirsa miletê wî yê kurd di bîrê de ye. Wî li ser xwe ferz didît ku her xizmetê jê re bikê. Sekin ji Nûredîn re nîn e. Li Zanîngeha Lozanê, ew di ber xwendina xwe re, kurd û Kurdistanê bi xwendekaran dide naskirin. Gava dibîne ku xwendekarên kurd hewceyî rêxistinekê ne ku wan bide hev û bi heve girêde (da bikaribin bi awakî fermî dan û sitandin û têkiliyan bi berpirsiyarên swîsrî û rêxistinên biyanî re pêk bênin), ew komela xwendekarên kurd li Ewropayê sala 1949'an didamezrîne û dibe serokê wê û kovarekê bi sernavê Dengê Kurdistan derdixin.

**Nûredîn Zaza û Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê**

Li Sûriyê, Nûredîn Zaza dibîne ku rewşa miletê kurd xirab e. Ji milekî ve, kurd ji nijadperestiya partiya Bea's di metirsiyê de ne. Li milekî dîtir, Partiya Komunîsta Sûriyê, ya qaşo Internasyonalîst, xwe ji neteweya ereban re kiribû parêzer, lê li dijê kurdan derdiket, hinga doza mafên xwe yên neteweyî dikirin û ew bi şovînîzmê tometbar dikirin. Nûredîn Zaza dinivîse: "Di rewşeke wisa de, min avakirina rêxistineke ku karibe nasnameya gelê Kurd biparêze û doza mafê wan yên rewa bike, pêwîst didît. Li Şamê, xwendekarên Gemnazyom û dibistanan pêkanîna wê projeyê ji min dixwestin. Herweha, welatparêzên kevnare, mela, muxtar, û cotaryên sade di pêkanînîna wê projeyê de, pîşta min digirtin û di paşiya sala 1957'an de, ew xewin pêkhat û Partiya Demokrata Kurdî li Sûriyê (PDKS) hate damezrandin.

PDKS, ji serokatiya xwe re, Nûredîn Zaza dihilbijêre û di demeke kurt de gelek kurd tevlî Partiyê dibin. PDKS, karekî mezin di warê siyasî û rewşenbîrî û civakî di nav kurdan de dike, ji lewra nav û deng û bandora wê xurt dibe di nav kurdan de. Lê di salên 1958 – 1961'ê de (dema yekîtiya Sûrî û Misrê), hikim di destê rêjîma Cemal Evdul Nasir ya dîktatûr de. Di wan her sê salan de rewşa siyasî, ewlekarî û aborî li Sûriyê kambax dibe. Berdevkê Nasir li Sûriyê Evdihemîd Elserrac û hêzên parastinê, te'dariyeke xirab li xelkê dikin û nemaze li kurdan û helbet li PDKS, ku hebûna wê weke metirsiyeke mezin li ser yekbûna dewleta erebî dibînin. Rêjîma Nasir, hemû bela û bêtarên xwe yên siyasî û aborî dike sukra gelê kurd de. Di çend rojan de, li dora 5000 endamên PDKS û serokê wê Nûredîn Zaza têne girtin. Piştî çendekê, behra mezin ji hevalan têne berdan. Nûredîn Zaza û 31 hevalê xwe di zindanên Helebê û Şamê (Mezê) de girtî dimînin. Girtiyên kurd gelekî têne lêxistin û îşkencekirin. Belê, behra mezin ji jiyana Nûredîn Zaza di siyasetê de çû. Lê di heman demê de, ew nivîskar û rewşenbîrekî mezin bû. Wî bi sedan gotar di rojname û kovarên kurdî yên mîna: Hawar, Ronahî û biyanî de nivîstibûn. Herweha wî Destana Memê Alan ji nûve çapkiribû û pêşgotineke hêja jê re nivîstibû û di sala 1982'an de, wî pirtûkek bi navê Ma vie de Kurde ("Jiyana min a Kurdî, yan jî Hewara miletê Kurd") nivîstibû, tê de behsa jiyan û xebata xwe ya netewî di ber pirsa kurdî û Kurdistanê de kiribû. Herwisa Nûredîn Zaza giringiyeke mezin dida pirsa zimanê kurdî û pêşxistina wî. Di banga xwe de Nûredîn Zaza ji kurdan re gotibû: "Gelî Kurdan! Heger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê heger hûn dixwazin xwe nasbikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, bi hevaltî û dostaniya miletên din bi pêş ve herin û bi rûmet û ser bilindî bijîn, dîse zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin."

**Salên dawî yên Nûredîn Zaza li Swîsreyê**

Dr Nûredîn Zaza salên xwe yên paşî li Swîsrayê dimîne. Li wir, ew di sala 1972'an de bi keçeke swîsrî bi navê Gilberte Favre re dizewice û di 1973'an de kurekî wan çêdibe, nav Chango Valéry (Şêngo Valéry) lê dikin. Ji ber nakokiyên siyasî yên di navbera Nûredîn Zaza û hevalên wî de, wî tercîh kir ku ji partiya xwe vekişe û berê xwe da Ewropayê, ku ew bi salan ji aliyê hevalên xwe ve hate jibîrkirin! Dr.Nureddîn Zaza piştî jiyaneke têr û tijî çalakî, êş, koçberî, girtin, nivîsandin û wergerandinê, di 7/10/1988'an de li Swîsrayê, dûrî welatê xwe, bêyî ku para heqê mirovî û têkoşer e, werbigire, ji ber nexweşiya penceşêrê koça dawî kir. Ew li goristana Bois-de-Vaux li bajarê Lozanê hat veşartin.

**Berhemên Nûredîn Zaza**

-Destana Memê Alan, Swêd sala 1973.
-Ma vie de kurde, Lozan sala 1977.
-Keskesor, Weşanên Nûdemê, Stockholm, Swêd, sala 1995.
-Bîranîn, Avêste, Stembol-Amed 2008.
-Gulê, weşanên Lîs, Amed 2015.

# Taybetiyê Sûrên Amedê

Sûrên Amedê avahiyeke dîrokî ye ku li navçeya Sûrê ya Amedê ye. Ji du beşan pêk tê: kela hundir û kela derve. Deriyên sereke yên di sûran de Deriyê çiyê (Deriyê Xarpêtê), Urfa Kapi (Deriyê Rûm), Mêrdîn Kapi (Tell Kapî) û Yenî Kapi (Dicle-Irmak-Şat derî) ne.

Sûrên Amedê yek ji dîwarên herî dirêj û herî baş ên cîhanê ye. Dirêjahiya wê 5200 metre, bilindahiya wê 10-12 metre û firehiya wê 3-5 metre ye. Li ser sûran bi giştî 82 birc hene. Ji bo xurtkirina parastina sûran birc hatine çêkirin. Sûrên Amedê di dîrokê de



mazûvaniya gelek şaristaniyan kiriye. Her çiqas dîroka avakirina yekem a sûran ne diyar be jî, tê texmînkirin ku ew ji aliyê Asûriyan ve beriya zayînê di sedsala 7an de hatine çêkirin. Sûr di serdema Roma, Bîzans, Selçûkî, Eyyûbî, Merwanî û Osmaniyan de gelek caran hatine avakirin, parastin û xurtkirin.

Sûrên Diyarbekirê di sala 1985'an de di Lîsteya Mîrata Dinyayê ya UNESCO yê de cih girt. Sûr îro yek ji girîngtirîn cihên geştiyariyê yên Amedê ne.

**Taybetmendiyên Sûrên Amedê wiha ne:**

Ew yek ji dirêjtirîn û herî baş dîwarên bajêr ên cîhanê ye.
Dirêjahiya wê 5200 metre, bilindahiya wê 10-12 metre û firehiya wê 3-5 metre ye.
Li ser sûran bi giştî 82 birc hene.
Her çiqas dîroka avakirina yekem a sûran ne diyar be jî, tê texmînkirin ku ew ji aliyê Asûriyan ve beriya zayînê di sedsala 7'an de hatine çêkirin.
Di dîrokê de dîwaran mazûvaniya gelek şaristaniyan kirine.
Di sala 1985'an de di Lîsteya Mîrata Cîhanî ya UNESCO yê de cih girt.
Sûrên Amedê yek ji hêmanên herî girîng ên mîrateya dîrokî û çandî ya Amedê ye. Sûr di parastina bajêr de roleke girîng lîstin û di pêşveçûna çandî ya bajêr de jî beşdar bûn.

# Amedekariyên demsala Zivistanê di nava dorpêçê de

Bi hatina demsala zivistanê re hikumeta Şamê her ku diçe dorpêça xwe li ser koçberên herêma Şehbayê girantir dike. Ev dorpêç bandora xwe li ser tavahî aliyên jiyanê dike û rê li ber zehmetiyên mezin vedike.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Herêma Şehbayê ji plan û êrîşên dijmin bê par namîne. Ji bo dagirkirina vê herêmê dijmin bi hemû hêza xwe li ser radiweste. Di encama van pilanan de zêdetirî 6 sala ye rojana êriş li ser herêmê ye ku piraniya wan koçberên Efrînê ne tê kirin. Rojane êriş li ser herêma Şehba ji milê dagirkerên tirk û çeteyên girêdayî wê ve tê kirin û gelek welatî di encama van êrişan de şehîd û birîndar bûne. Hikumeta Şamê her dixwaze herêma



Şehbayê careke din bixe bin serweriya xwe de û vîna gel bişkîne. Li ser vî bingehî zêdetirî 5 sala ye hikumeta Şamê dorpêça xwe li ser herêmê ferz dike û jiyana welatiyan dike nava xeterî û zehmetiyê. Bê guman ev yek bandora xwe li ser tavahî aliyên jiyanê dike û rê li ber zehmetiyên mezin him li ser saziyan û him jî li ser gel ava dike. Bi hatina demsala zivistanê re jî yekser pêwîstiya gel û zarokên dibistanan bi sotemeniyê heye, lê ji ber dorpêçê nayê peyda kirin. Girêdayî dorpêça hikumeta Şamê ya ku gel jê bêzar bûye endamê Kordînasyona Rêveberiya herêmî Mehmûd Reşîd ya Efrîn û Şehba û herwiha hevserokê desteya fêrkirin û hînekariyê mamoste Fadil Çawîş ji rojnameya me re axivîn.

**"Hikumeta Şamê û siyaseta birçîbûnê"**

Mehmûd destpêkê de bal kişand ser siyaseta Hikumeta Şamê û wiha got: "Siyaseta Hikumeta Şamê ya ku li ser herêmê dide meşandin, siyasetekî gelek qirêj û zirav e. Ev bû zivistana Şeşemîn li ser koçberên Efrînê re derbas dibe û her sal eynî polîtîka tê meşandin. Siyaseta dorpêçê weke siyaseta birçîbûnê mirov dikare pênase bike derveyî wê tu nav nîne. Her tim beriya demsala zivistanê pirsgirêk û zehmetiyan derdixe. Bi armanca vala kirina herêmê û destkeftiyên ku di herêmê de hatine bidestxistin careke din têk bibe û ewlehiya herêmê têk bibe. Her çiqas di aliyê siyasî de pilan bên kirin jî, lê belê yekser ev yek li ser rewşa sivîl, gel û zarokan bandor dike".

Mehmûd anî ziman ku bê madeyên sotemeniyê jiyan nayê meşandin û wiha domand: "Zivistana derbasbûyî gelek giran bû li ser gel. Bi awayekî giştî madeyên sotemeniyê derbasî herêmê nekirin. Rêjeya ku derbas dibû jî gelek kêm bû û bi baceyên pir giran derbas dikin. Êdî di encama vê polîtîkeyê de gel neçar ma ku daran bibirin, rûxmî ku dar qutkirin ne ji çanda me ye. Lê di demsala zivistana qels de sivîl neçar man ji bo zarokên xwe vê yekê bikin. Hikumeta Şamê her tim bi van piratîkan herêmê ji her alî ve tengav dike û rê li ber pirisgirêkên civakî û alûziyan vedike. Rûxmî van zehmetiyan jî gel li ber xwe dide û li hember polîtîkeyên dijmin têdikoşin".

**"Siyaseta li ser Şehbayê tê meşandin derveyî pîvanên mirovî ye"**

Mehmûd têkildarî kar û xebata şeredariyê û bê çarebûyîna wan



**Mehmûd Reşîd**



**Fadil Çawîş**

li hember van polîtîkeyan ev yek anî ziman: "Di destpêka ku em derbasî herêma Şehbayê bûne de, rûxmî zehmetî û êşa koçberiyê. Lê belê rojê 6 saetan kehrebe dihat pêketin. Demsala havînê ji ber germahiya zêde saetên kehrebê dihatin zêde kirin. Gaz û mazot li ser gel dihat belav kirin. Lê ev bû 3 salin ku di rojê de 3 saetan tenê kehrebe li ser gel tê belav kirin. Îsal jî di havînê de derfetên ku em bi roj jenetoran pê bixin kêm bû. Herwiha herêma Şehbayê di gelek şeran re derbas bû, me hewil da ku riyên xerabûne herî kêm sererast bikin. Lê ji ber tune bûna sotemeniyê me temam nekir. Herwiha di aliyê paqijiyê de berê heftê 3 caran paqijiya gundan dihat kirin, lê di rewşa heyî de tenê hefê carekê paqijî tê kirin. Li gorî şert û mercên zehmet yên dorpêçê tişta ku em dikarin bikin ev in. Bê guman gelek kêm e, lê siyaseta li ser herêmê tê meşandin siyasetekî derveyî pîvanên mirovî ye".

**Bandora dorpêçê li ser xwendekaran**

Girêdayî heman mijarê bandora dorpêçê li ser rewşa xwendin û xwendekarên dibistanan jî heye û girêdayî vê yekê jî mamoste Fadil wiha anî ziman: "Bandor û zehmetiyên dorpêçê çawa ku li ser gel tesîr dike. Xwendekar jî jê ne qutin. Dibistan di zivistanê de gelek sar in û zarok tehmûl nakin. Zêdetirî 3 sala ye di encama dorpêça Hikumeta Şamê de mazot li ser dibistanan nayê belav kirin. Rêjeya ku belav dibe jî têra yek mehî nake. Demsala zivistanê şagirtên herêma Şebayê yê li ber sermayê derbas dikin. Herwiha di aliyê peyda kirina pêdiviyên xwendinê de em di heman zehmetiyan re derbas dibin. Peyda kirina qirtasiye û alavên xwendinê ji bo xwendekaran gelek zore û buhayê wan girane. Di heman demê de pirtûkên şagirtan derbas kirin bi awayekî gelek zahmet tê kirin. Di encamê de ev zehmetî hemû yekser bandora xwe li ser piskeolojiya xwendekar dike, lê ew jî di nava berxwedanê de tekoşînê dikin.

# Di xebatên Tirafîkê de rola jinê sereke ye

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Li herêma Cizîrê ji bo rêxistin kirina kar û xebatên welatiyan di milê çûn û hatinê de, di dawiya sala 2013`an de tirafîk hat avakirin, û jinê bi awayekî aktîv di nav de cihê xwe girt, roj bi roj kar û xebatên xwe berfirehtir kir û ji bo xizmeta civakê gavên girîng avêtin.**



Ji bo xizmeta civakê di dawiya sala 2013`an de navendek bi navê ewlehiya civakê hat avakirin, paşî di sala 2014`an de navê wê veguherî navenda tirafîkê . wek tirafîk bi demê re kar û xebatên xwe pêşxist û gelek xizmet ji bo rêxistin kirina civakê kir.

Di derbarê kar û xebatê Tirafîkê de rêvebera Tirafîka Herêma Cezîrê Jiyan Hisên ji rojnameya me re axivî.

**Zehmetiyên ku tirafîk dibîne**

Rêveberiya tirafîka herêma Cizîrê Jiyan Hisên daxuyanî kirin ku gava jinê cihê xwe di nav tirafîkê de girt rastî gelek zehmetiyan hat û wiha got:" Civakê qebûl ne dikir ku jin bi vî karî rabe û erebeyan bi sekinîne û birêxistin bike lê bi demêre jinê xwe isbat kir ku dikare vê sîstemê bi rêve bibe di heman demê de civak neçar bû ku vê yekê qebûl bike û bibe alîkar bi me re. yek ji zehmetiyên ku tirafîk dibîne tengbûna riya ye û di heman demî de tinebûna rawestgeh û zêdebûna erebeyan di nav bajar de, hin ajokar hene zagonan binpê dikin û nabin alîkar bi tirafîkê re."

Jiyan Hisên diyar kir ku hayanî niha tirafîkê gelek piroje pêk anîne û wiha got:" Me radar li ser rê danîne ji bo lezbûna ajokar û sembolên tirafîkê danîne ji bo kêmbûna kirîza tirafîkê di nav bajaran de, di heman demê de birûşûrên me hene em li ajokaran belav dikin, ev birûşûr ji bo ajokarên ku erebeyên wan bê ronî û ji bo zarokên temen piçûk yên ku erebeyan diajonin, dema ku ajokar van zagonan pêk neynin em li hemberî wan cezayên madî dispînin û erebeyên wan dikin bin ragirtinê de heya demek destnîşankirî."

**Projeyên tirafîkê yên di demên pêş**

Rêvebera Tirafîka Herêma Cezîrê Jiyan Hisên dawî li axaftinên xwe



anî û wiha got: "Di rewşa heyî de navenda tirafîkê gihaye asteke baş, êdî heval tora hundirîn bikar tînin ji bo qeydkirinê, diziya erebeyan,mator û kêmkirina qezayên ku bi hijmareke mezin çêdibin. Pirojeyên me yên dema pêş de me dest bi çêkirina riyên dirêj kiriye, bizmarên ronîkirî li riya bixin wek enîşk û xebte ji bo ku ajokar riya xwe nas bike, tevlî vê yekê perwerdeyên me hene her demekî em hijmarek ji endamên xwe rêdikin da ku bêtir kar nas bikin û birêve bibin. Hêviya min ji bo milet ku zarokên xwe hişyar bikin û di temenekî piçûk de erebeyan nekin destê wan de him ji bo silametiya wan him jî ji bo ev zagonên me binpê nebin."



# QSD'ê bîlançoya êrişan eşkere kir

**Navenda nûçeyan**

Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) bi daxuyaniyekê bîlançoya êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê aşkera kir.

**Daxuyanî wiha ye:**

"Dewleta Tirk a dagirker di 5ê cotmehê de êrişeke berfireh li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê da destpêkirin û çalakiyeke li Enqereyê wekî hincet nîşan da, lê têkildarî tawanên li dijî hêzên me ku yên çalakî kirine ji herêmên me ne, tu delîl nin in.

Di êrişa nemerdane ya xedar de piraniya saziyên xizmetguzarî, aborî, stasyonên enerjiyê (Petrol û Kehrebe), av, hin baregehên leşkerî, îşaetên medenî û gundên tijî sivîl hatin hedefkirin.

Dewleta Tirk a dagirker bi van êrişên xwe yên dijminane hewl dide qeyranên xwe yên civakî, aborî û siyasî yên li Tirkiyeyê binixumîne û derxîne derve. Ji vê zêdetir her tim hewl dide dagirkeriya xwe rewa bike.

Dewleta Tirk a dagirker di êrişên xwe yên dijminane de, zêdetirî 30 balafirên bê mirov ên bi çek bi kar anîn û di saetên êvar û şevê de piraniya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi balafirên şer kirin hedef. Herwiha deverên niştecihan, navendên xizmetguzariyê û yên sivîl bi çekên giran topbaran kir. Li dijî gundewarên başûrê Efrînê, herêmên Şehba, Minbic, Kobanê, Eyn Îsa, Til Temir, Zirgan, Hesekê, Qamişlo, Amûdê, Tirbespiyê, Çilaxa û Dêrikê êrişên hewayî pêk anîn. Di encamê de hejmareke sivîl û leşker şehîd bûn û bi dehan jî birîndar bûn. Her wiha ziyanên mezin bi navendên xizmetguzariyê bûn.

Ev êrişên xedar ên dewleta Tirk a dagirker tevahî erdîngariya Sûriyeyê û tevahî pêkhate û gelên herêmê bi Kurd, Ereb û Suryanên xwe dike armanc. Li aliyekî din rêxistina DAIŞ'ê a terorîst zindî dike û hêzê dide wê da ku çalakiyên xwe yên terorî zêde bike. Ev yek jî xetereyeke mezin li ser herêmê û tevahî cîhanê çêdike. Em diyar dikin ku hêzên me (Hêzên Sûriyeya Demokratîk) mîsyon û erka xwe ya parastina gel û ewlehiya xaka xwe pêk tînin. Ev êriş û dijminatî îsrara me ya parastina herêmên me û xelkê me zêdetir dike.

Em tevahî gelên herêmê silav dikin ku li hemberî êrişên hovane yên dewleta Tirk a dagirker sekinîne. Ev yek nîşan dide ku ruxmî êrişan gelê me bi xak û axa xwe ve girêdayî ye.

Herwiha em teqez dikin ku em ê bersiva tevahî êrişên li ser ewlehî û istiqrara herêmên xwe bidin. Çalakiyên ku hêzên me kiribûn di çarçoveya bersiva li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmên me pêk hat.

Hêzên Koalîsyona Navneteweyî droneke dewleta Tirk a dagirker ku nêzî baregeheke wê bibû kir hedef. Lê ji koalîsyon û Rûsyayê tê xwestin ku helwesteke zelal li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser sivîl, saziyên xizmetguzarî û medenî yên giştî bidin.

**Bîlançoya êrişan wiha ye:**

Hejmara şehîdan: 15. Di nav de 8 sivîl, 6 endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn ku bi parastina deverên xizmetugariyê erkdar in, şervanekî QSD'ê hene. Herwiha hejamrek birîndar bûn.

**1-Bajarokê Til Temirê û gundewarên wê:**

-Balafira bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker stasyona avê ya li gundê Tewîla bombebaran kir. Di encamê de ziyanên madî çêbûn. Di heman demê de gundê Rikuba hat hedef girtin û ziyanên madî çêbûn.

- Balafireke bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker baregeha hêzên ma ya li nêzî gundê Dirdara bombebaran kir û di encamê de ziyanên madî çêbûn.

**2-Bajarokê Amûdê û gundewarê wê:**

- Balafireke bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker gundê Til Hebeşê bombebaran kir. Di encamê de 6 endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn şehîd bûn û 2 endam birîndar bûn. Herweha stasyona ceyranê ya li Amûdê hate bombebaran kir.

-Herweha ji milê dagirkeriya tirk ve û bi hawan û obîsên giran gundên Bobî û Dabat Ebdullah û Mişêrfê topbaran kirin.

**3-Bajarê Qamişlo û gundewarê wê:**

-Dewleta Tirk a dagirker bi balafireke bê mirov a bi çek stasyona ceyranê ya li Qamişlo kir hedef. Di encamê de ziyanên madî çêbûn û depoyeke pîşesaziyê bombe kir û ziyanên madî bi depoyê bûn û aşê bûzê yê li derdora gundê Girbawî hate bombebaran kirin.

- Gundê Til Xatûn yê girêdayî bajarokê Tirbespiyê bi balafirên bê mirov ên bi çek hatin bombebarankirin. Stasyona petrolê ya li gundê Mizgefê hate bombekirin. Di encamê de ziyanên madî çêbûn.

- Cihekî aborî ji aliyê balafira bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker hat bombekirin û ziyanên madî çêbûn. Li Tirbespiyê 4 deverên petrolê hatin bombebarankirin. Di encamê de sivîlek şehîd bû. Herwiha yek jê zarok bi giştî 5 kes birîndar bûn.

-Stasyona ceyranê ya li Tirbespiyê hat hedefkirin û ji xizmetê derket.

**4-Bajarê dêrikê û gundewarên wê:**

- Balafireke bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker derdora Bendava Çilaxa bombebaran kir. Stasyona Al Qews jî hat hedefkirin û ziyanên madî çêbûn.

-Di saetên êvarî de gundên Xana Serî û Sêgirka û stasyona ceyranê yên li bajarokê Çilaxa 7 caran ji aliyê balafirên şer ên dewleta Tirk a dagirker hatin bombebaran kirin û nexweşxaneya Korona ya li gundê Girê Vira hate hedefkirin. Di encamê de 2 karkerên nexweşxaneyê birîndar bûn. Stasyona derxistina ceyranê ya li Siwêdiyê 8 caran bi balafirên bê mirov ên bi çek hat bombekirin û ji xizmetê derket.



**Bajarê Hesekê:**

- Balafirek bê mirov a bi çek a dewleta Tirk a dagirker kargeha remlê ya nêzî gundê Mişêrfê bombebaran kir. Di encamê karkerekî şehîd bû û 3 karkerên din birîndar bûn. Herweha erebeyek jî hate bombebaran kirin. Di encama bombebaranê de 2 şervanên me bi sivikî birîndar bûn.

- Balafirek bê mirov a bi çek derdora kampa Waşûkanî ya koçberên Serêkaniyê kir hedef. Di encamê de sivîlek şehîd bû û 2 sivîl birîndar bûn.

**6-Herêma Firatê:**

- Dewleta Tirk a dagirker bi balafireke bê mirov a bi çek li bajarokê Çelebiye yê navçeya Eyn Îsayê motorsîklêtek bombebaran kir. Di encama bombebaranê de 2 sivîl şehîd bûn û 2 birîndar bûn. Herweha bajarokê Sirînê jî hate bombebaran kirin. Di encamê de sivîlek şehîd bû û 2 sivîl birîndar bûn. Baxçeyên sebzeyan ên li nêzî bajarokê Sirînê jî hat bombebaran kirin. Di encamê de 2 karkerên sivîl şehîd bûn.

**7-Minbic**

Artêşa Tirk a dagirker bi çekên giran û obîsan gundên Girhiyok, Kokilî, Qertwêran, Mihsinlî, Seyada, Ewn Dadat, Cat, Şêx Yehya û Qereqozaq topbaran kirin. Di encamê de şervanekî Meclisa Leşkerî ya Minbicê şehîd bû.

**8-Gundewarê başûrê Efrînê û herêmên Şehbayê:**

-Artêşa Tirk a dagirker nuqteya hêzên hikumeta Şamê ya li gundê Meyasa yê navçeya Şêrawayê bi balafira bê mirov a bi çek bombebaran kir. Di encamê de 2 leşkerên hêzên hikumeta Şamê birîndar bûn û gundê Zîwanê yê Şehbayê Jî bi çekên giran hate topbaran kirin.

-Dewleta Tirk a dagirker derdora navçeya Til Rifetê ya herêma Şehbayê bi çekên giran topbaran kir. Gundê Meranaz ê navçeya Şerayê yê başûrê Efrînê, herêma navbera gundên Til Cemal û Ziyaretê yên navçeya Şêrawayê bi çekên giran topbaran kir. Gundên Meyasê, gundê Mezin, Kalûta, daristana Soxanekê û Bênê yên navçeya Şêrawayê, her wiha gundên Meranaz, Şewarxa û Kiştar ên Şerayê yên li başûrê Efrînê bi çekên giran topbaran kirin."

# KCK: Divê Komploya Navneteweyî were bidawîkirin

**Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê got: "Em ê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk bînin. Ji bo bi dawîkirina komploya navneteweyî, divê gelê Kurdistanê û dostên wê têkoşînê geş bikin."**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku bi têkoşîna li dijî komployê zanebûna azadiyê hîn zêdetir pêş ketiye û têkoşîna gelê Kurd bûye gerdûnî û got: "Êdî tişta ku ji vir û şûn de were kirin, şikandina tecrîda li Îmraliyê, pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û bi dawî kirina komploya navneteweyî ye."

Hevserokatiya Konseya Rêveber a Komalên Civakên Kurdistanê (KCK) têkildarî komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê ya li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku dikeve sala 26'emîn de, daxuyaniyeke nivîskî da.

**Daxuyanî bi vî rengî ye:**

"25 sal di ser komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêber Apo derbas bû. Em careke din bi nefret û tundiyeke mezin komploya navneteweyî ya ku di plana qirkirina Kurdan de hatiye kirin û hemû hêzên ku di komployê de cih girtine şermezar dikin. Em hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê yên ku bi pêşengiya hevrê Halît Oral û Aynûr Artan bi dirûşmeya 'Hûn Nikarin Roja Me



Tarî Bikin' li dora Rêber Apo çembera agir çêkirin, bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Keda mezin û bîranînên şehîdan meşaleya ku rêya me ronî dike ye. Em di rêya ku ew ronî dikin de dimeşin û ber bi pêş ve diçin. Bi vê wesîleyê em careke din soza xwe ya têkoşîn û serkeftinê didin şehîdan.

**Li dijî komployê em di nava têkoşîneke bênavber de ne**

Weke gelê Kurd û Tevgera Azadiya Kurd ev 25 sal in li dijî komploya navneteweyî em rêya têkoşerên 'Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin' dimeşin û li dijî komployê di nava têkoşîneke bênavber de ne. Gelê Kurdistanê zû pê hesiya ku komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo li dijî wan pêk hatiye û ji destpêkê heta roja îro li hemberî komploya navneteweyî helwesteke tund nîşan dan û xwedî li Rêber Apo derket. Ev helwest û piştgiriya gelê Kurd îro li hemû cîhanê belav bûye; gel, jin, ciwan û hemû bindest piştgiriyê didinê.

Weke tevgera azadiya Kurd em careke din di salvegera 25'emîn de komplo û hêzên komploger şermezar dikin û gelê Kurdistanê yê welatparêz ku 25 sal in li dijî komployê di nava têkoşîn û çalakiya bênavber de ye û li ber xwe didin û bi dilsoziya bi Rêber Apo re, pûçkirina komployê ji xwe re kir armanca bingehîn, pîroz dikin. Herwiha em spasî û silavên xwe ji her kes, gel, jin, ciwan, dost û hemû hêzên demokrasiyê yên li Rojhilata Navîn û cîhanê yên ku li dijî komployê helwest girtine, bi gelê Kurdistanê re di nava piştevaniyê de ne, dikin.

**Divê mirov hîn zêdetir rastiya komployê fêm bike**

Ji bo ku di şexsê Rêber Apo de komploya navneteweyî ya li dijî gelê Kurd bi temamî were pûçkirin, pêwîstî bi fêmkirina rastiya komployê û sedemên vê komployê heye. Ji ber ku di serî de DYE û Îsraîl gelek hêz beşdarî komployê bûn. Ne tenê cih girtin, komployek wiha plan kirin û pêk anîn. Ji ber vê yekê komplo di asta navneteweyî de pêk hat û di wê astê de encamên wê derketin. Bêguman serdema 9'ê Cotmehê di encama ferzkirinên dewleta Tirk de pêk hat. Dewleta Tirk di bin bandora zihniyeteke antî-Kurd de, bi armanca tepisandina têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd û qirkirina Kurdan, tev geriya. Ji bo vê jî weke îro zext li her kesî kir ku piştgiriyê bide polîtîkayên qirkirina Kurdan. Gelek hêz ji bo ku ji vê helwesta dewleta Tirk sûd werbigirin, piştgirî dan helwestên li dijî Kurdan û Rêber Apo. Weke ku tê zanîn di wê serdemê de dewleta Tirk helwestek li hemberî Sûriyeyê nîşan da û eşkere nîşan da. Helbet dewleta Tirk li gorî piştgiriya ku ji DYE û Îsraîl girtibû ev helwest girt û gefa şer li Sûriyeyê xwar. Ji ber ku Rêber Apo dizanibû ku şerekî bi vî rengî bi armanca pêkanîna planên hêzên moderniteya kapîtalîst ên Rojhilata Navîn e, ji bo pêşî li pêvajoyeke bi vî rengî bigire, biryara derketina ji Sûriyeyê da û di 9'ê Cotmeha 1998'an de ji Sûriyeyê derket. Dema ku Rêber Apo biryara derketina ji Sûriyeyê da, di heman demê de armanca çareseriya pirsgirêka Kurd jî derbasî platformeke siyasî bû û ji bo vê jî çûyîna Ewropayê guncaw dît. Rêber Apo difikirî ku li Ewropayê xebatên bi vî rengî dikarin bên kirin û ji bo çareseriya siyasî ya demokratîk a pirsgirêka Kurd piştgirî wê were dayîn. Lê mixabin DYE û Îsraîlê komployeke navneteweyî xist dewrê û pêşiya pêvajoyeke wiha hat girtin. Weke ku tê zanîn ev pêvajo bi pêkanîna komploya navneteweyî bi encam bû.

Hêzên ku komploya navneteweyî plan kirin û meşandin, DYE û Îsraîl bûn. Ji ber ku xeta Rêber Apo li pêşiya planên ku DYE dixwaze bi rêya Kurdan pêk bîne asteng e û li dijî sîstema Rojhilata Navîn a li ser bingeha ewlekariya dewleta Îsraîlê ye, DYE û Îsraîlê planek bi vî rengî çêkirin û bi destê NATO'yê ev plan hat meşandin.

**Heta ku encam tê wergirtin, divê her kes têbikoşe**

Gelê Kurd û dostên wê ev geşedan derxistin holê û berovajî bendewariyên hêzên komploger, encam afirandin. Êdî tişta ku ji vir û şûn de were kirin, bi helwest, bertek û çalakiyeke hîn xurttir şikandina tecrîda li Îmraliyê, pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û bi dawîkirina komploya navneteweyî ye. Em dibînin ku di gelê Kurd û dostên wê de ev îrade û helwest pêş dikeve. Teqez divê em vê îradeyê danin holê û komploya navneteweyî bi dawî bikin. Hetanî îro bi têkoşîna hatî dayîn, pêşî li armanca komployê hat girtin û hat îspat kirin ku di encama têkoşîna li dijî komployê geşedanên mezin hatin afirandin. Wê demê ji bo em armanca xwe pêk bînin, divê em têkoşîna xwe hîn geştir bikin. Li ser vî bingehî em bang li hemû Kurdistaniyên welatparêz, ciwanên Kurdistanê yên welatparêz, gelên Rojhilata Navîn û cîhanê, jinan, hêzên demokratîk, dost, karker, kedkar, gundî û hemû civakên çewisandî dikin ku li dijî komploya navneteweyî têkoşînê geştir bikin û heta ku encamê werdigirin, vê helwestê bidomînin."

# Pêwîste ku dagirkeriya Tirk di dadgehên navnetewî de were dadgehkirin

Ev zêdeyî 5 salane ku li Efrînê ji milê dagirkerên tirk û çeteyên wê ve sûcên dij mirovî têne meşandin. Di serî de jin, zarok têne kuştin û xweza ser erd û bin erdê Efrînê tê talan kirin û li hemberî civakê qirkirineke çandî û fikrî tê meşandin. Herweha li ser axa Efrînê kampên mîtingeriyê têne ava kirin û penaberên sûrî yên ku tirkiyê wan bi darê zorê der bi der dike li wan kampan bi cih dike.

**Elî Roj**

Girêdayî kiryar û sûcên dij mirovî yên ku dagirkeriya tirk li Efrînê dide meşandin û li hemberî van kiryaran bêdengiya saziyên mafê mirovan ên navnetewî, çalakvanê hiqûqî û endamê Rêxistina Mafê Mirovan li Efrîn – Sûriyê Ibrahîm Şêxo bersiva pirsên Rojnameya me da.
Hevpeyvîn wiha ye:



**1-Di serî de ev zêdeyî 5 salane ku bajarê Efrînê ji milê dewleta tirk a faşîst ve hatiye dagirkirin û rojane kiryarên dij mirovî û guhertina demugrafîk pêktîne. Heyanî îro tu saziyên navnetewî li hemberî sûcên dij mirovî yên ku li Efrînê têne kirin bertekên xwe raber kiriye yan na û eger ku heyanî îro û li gorî ku tê xwestin dengê xwe nekirine sedemê vê yekê çiye.**

Endamê Rêxistina Mafê Mirovan li Efrîn – Sûriyê Ibrahîm Şêxo diyar kir ku dagirkeriya tirk çeteyên Opisisyona Sûriyê yên ku bi navê artêşa netewî têne bi nav kirin û bermahiyên çeteyên DAIŞ'ê li herêmên dagirkirî di serî de Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî bi cih kirine. Ev hemû komê çeteyên ku me nave wan anî ser ziman kiryarên dij mirovî li herêmên hatine dagirkirin dimeşînin. Herweha li hemberî van kiryarên ku têne kirin jî bêdengî û çav girtineke heye. Li gorî naveroka madeya 42an a di metnê biryarên ku li Lahayî di sala 1907an hatine girtin: Dema ku axa dewletekî ji milê artêşa dewleteke din ve hatibe desteserkirin tê wê wateyê ku ew dewlet hatiye dagirkirin. Lê li hemberî vê rewşê ner rejîma Sûriyê û ne jî tu aliyên din dengê xwe ji vê yekê re nakin.
Ibrahîm Şêxo diyar kir ku ji beriya dagirkirina Efrînê rêjeya Kurdên ku li Efrînê 80% bû, lê piştî dagirkirina Efrînê ev rêje gelekî kêmbûye û di dema neha de derdorî ji sedî 40% kurd li Efrînê mane. Ji ber ku li bajarê Efrînê guhertina demugrafîk di asta herî jor de tê meşandin. Dagirkeriya tirk bi gelek rê û rêbazan dixwaze welatiyên kurd yên ku li Efrînê mane wan jî koçber bike û ji bona vê yekê pişaftineke çandî û hişmendî li ser wan dide meşandin. Hemû saziyên navnetewî yên mafê mirovan hevkarê dagirkeriyê ne û çavê xwe ji van giryaran digrin û dengê xwe nakin. Em weke saziya mafê mirovan ya Efrînê hemû kiryarên dij mirovî yên ku dagirkiriya Tirk li Efrînê dike pelege dikin û gelek sazî û kesayetên ku kar û xebatên mirovî didine meşandin bi mere alîkarin û ew jî van kiryaran pelge dikin û wan radestî cihên peywendîdar dikin. Herweha rapora komîteya lêpirsîna navdewletî ya di meha Îlonê de deketî her çiqasî ne li gorî ku dihate xwestin be jî, lê gavekî baş bû û cara yekem bû ku saziyeke mafê mirovan a navnetewî tirkiyê weke berpirsyarê komên çete yên ku sûcên dij mirovî li Efrînê didine meşandin dibîne. Herweha rêxistina EMNIST ya navnetewî jî raporên wan jî derketin û biryarên ku têne girtin dibe ku ne li gorî ku têne xwestin bin, lê heyanî astekî bandora wan hebû. Lê ji ber ku bercewendiyên di navbera dewletan de di ser her tiştî re ne, saziyên navnetewî jî girêdayî siyaseta dewletane û di vî warî de li ser erdê ne xwedî biryarin û gelek caran tenê ya wan gotin dimîne û biryarên ku têne girtin nayên pêkanîn.
Herweha Ibrahîm Şêxo got ku:Rêxistin EMNIST ya navnetewî di dema dawiyê de ji tirkiyê re digot ew li Efrînê hêzeke dagirkere û sûcên dij mirovî pêktîne û girêdayî vê yekê jî du raporên wan derketin. Yek ji wan raporan di dema erdhejê de bû û ya din jî di dema komkojiya Cindirêsê de bû û wê saziyê ji dagirkeriya tirk re işkere digot tirkiyê hêzeke dagirkere û li Efrînê guhertina demugrafîk pêktîne. Ev yek jî encama karê hiqûqî û diblomasî yê ku tê meşandine, lê hîn jî ev kar ne di asta ku tê xwestin de ye. Lê li ser erdê jî gelek zehmetî hene ew jî girêdayî belgekirina kiryarên dij mirovî yên ku li Efrînê têne kirin û heyanî ku agahî têne bi dest xistin gelek zehmetî têne kişandin. Ji ber van sedeman binpêkirinên ku li Efrînê têne kirin ji sedî 30 nayê belge kirin. Ji milekî din ve jî aliyên peywendîdar yên ku belge gitiştine destê wan jî li ser nayê seknan din û tê pişt guh kirin. Weke din jî gelek dewlet ji ber bercewendiyên xwe bi dagirkeriya tirk re çavê xwe ji kiryarên dij mirovî yên ku ew dike re digrin. Hebûna tirkiryê di nava NTO de cesaretê dide wê ku roj bi roj van sûcan hîn zêdetir bike.

**2-Bi destê henek dewlet û aliyên mîna dewleta Kiwêt, Qeter û Saziyên filistînî guhertina demugrafîk li Efrînê tê pêkanîn û kampên mîtingeriyê tê avakirin, hûn vê yekê çawe digrin dest û çime kes dengê xwe ji vê yekê re nake.**


Ibrahîm Şêxo destnîşan kir ku li Efrînê û li ber çavê cîhanê tevahî guhertina demugrafîk tê çêkirin û ji sala 2020an ve li Efrînê kampên mîtingeriyê bi destê saziyên qaşo bi navê mafê mirovan kar dikin tên avakirin. Dema ku Efrînê ji milê dagirkerên tirk ve hate dagirkirin zêdeyî 300 hezar welatiyên Efrînê bi darê zorê hatin derxistin û li şûna wan jî zêdeyî 450 hezarî Ereb, Turkimen û heyanî malbatên Filistînî jî li Efrînê hatin bi cih kirin. Ji ber vê yekê Erdoxan ji beriya ku êrişî Efrînê bike digot ku rêjeya Kurdan li Efrînê ji sedî 35 e. Ev gotin ji beriya 20/1/2018 û destpêka amedekariyên êrişên li ser Efrînê. Di dema neha de û di bin navê ku dagirkeriya tirk malbatên ku wan derbasî Efrînê kirine wan ji konan derdixin û malan ji wan re ava bikin, kampên mêtingeriyê ava dike û guhetina demugrafîk bi vê riyê pêktîne. Di dema neha de zêdeyî 30- 35 kampên mîtingeriyê li Efrînê hatine çêkirin û hîn jî ev yek berdewame. Bi taybet jî li navçeya Cindirêsê, Şiyê, Şêrawa û Mabata û Şeran û bi taybet jî li gundê Şadêrê û cebel Ahlam kamp hatine avakirin. Ji wan kampên mîtingeriyê yên ku hatine çêkirin kampa besma û gelekên weke wê yên ku bi alîkariya dewleta Qeter û Kiwêtê ev yek tê kirin. Ji bona van dewletên ku destekê didin degirkeriya tirk, me weke saziya mafê mirovan li Efrîn – Sûriyê me di sala 2022an de peywendî bi wan re çêkirin û wan ji mere wê demê gotin em ê, destê xwe ji vê yekê bikşînin, lê berûvajî vê yekê ew hîn jî hevkariya dagirkeriya tirk dikin.

**3-Gelek penaberên Sûrî yên ku li tirkiyê dimînin bi darê zorê li heremên dagirkirî û di serî de li Efrînê têne bi cih kirin û herkes dizane ku ev yek bi destê dagirkeriya tirk tê kirin, lê ne rejîma Sûriyê û ne jî tu aliyên din denê xwe nake. Hûn vê yekê çawe dinirxînin.**

Ibirahîm Şêxo girêdayî derxistina penaberên Sûriyê bi darê zorê ji tirkiyê û ew li Efrînê bi cih kirin ev agahî parvekirin û got: Heyanî neha zêdeyî 30 hezar penaberên Sûrî bi darê zorê ji tirkiyê hatine derxsitin û ew li herêmên dagirkirî hatine bi cih kirin. Li gorî xwe tirkiyê dibêje ku ew penaberên Sûriyê derbasî deverên bi ewle û aram dike, lê li van heremên ku hatine dagirkirin û di serî de Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê,Cerablus û Ezazê rojane şer, pevçûn, kuştin, revandin, talan, tecawiza jin û zarokan tê kirin. Kesên ku derbasî van deveran dibin piraniya wan erebên bajarê Idlib, Hema, Heleb, Dêrezor û gelek heremên din yên Sûriyê ne. Ibrahîm Şêxo da xuyakirin ku raste ew dixwazin penaberên Sûrî vegerin cih û warê xwe, lê pêwîste ku her kesê ku ji cihê xwe penaber bûye vegere cihê xwe, ne li şûna wê kesên din yên ku ne xelkê wê herêmê ne dest deyînin ser mal û milkên niştecihên resen yên wê herêmê û weke ku ew milk û mal yê wane û kes xwediyê wan nîne. Guhertina demugrafîk li Efrînê bi rengekî sistematîk ji milê dagirkeriya tirk ve tê meşandin. Ev yek jî ne di berjewendiyê gelê Sûriyê de ye berûvajî vê yekê ev yek raste rast dikeve xizmeta dagirkeriya tirk û ew dixwaze heremê têxe nava şerekî navxweyî yê dem dijêr. Li hemberî vê yekê hikumeta Şamê, Rûsiya û Îran jî çavê xwe ji vê yekê digrin û li hmberî wê tu bertekekeî wan ê cidî nîne. Ji milekî din ve jî hikûmeta Şamê rêveberiya xweser dike hedef û hertim wê bi parçebûna axa Sûriyê tewambar dike.
Ibrahîm Şêxo di berdewamiya axaftina xwe de got ku; ew weke rêxistina mafê mirovan li Efrîn û Sûriyê daxwaz ji hemû saziyên navnetewî dikin ku li hemberî vê kiryarên dagirkeriya tirk dengê xwe bilind bikin û dawiya dagirkeriya bînin û alîkariya gelê Sûriyê yê ku ji welatê xwe koçber bûyî bikin ji bona ku bi rengekî bi ewle vegere ser ax, mal û milkên xwe.

**4-Weke ku tê zanîn gelê Efrînê bi darê zorê ji Efrînê hate derxisin û rojane li Efrînê qirkirina çandî, hişmendî û xwezayî tê meşandin û tu rewşeke aram li Efrînê nîne heyanî ku welatî vegerin cih û warê xwe. Lê gelek alî û di serî de ENKES'ê dixwazin welatiyên Efrînê bixapînin û şerekî taybet û derûnî li ser wan bidin meşandin. Hûn weke rêxistina mafê mirovan a Efrînê vê rewşê çawe dinirxînin.**

İbrahîm Şêxo an ziman ku li Efrînê rojane sûcên dij mirovî di derbarê jin, kal, zarok û xwezayê de têne kirin. Herweha cihên dîrokê têne talan û wêran kirin û her sal dagirkeriya tirk û çeteyên wê dema demsala jêkirina zeytûnan tê ew dest talanê dikin û bi zorê berhemê welatiyan ji wan distînin. Di serî de ENKES'ê û yên ku cihê xwe di opisisyona Sûrî de digrin ew jî destê wan di dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê Girê Spî de heye û ew hevkarê sûcên ku li wan deveran têne kirin in. Ibrahîm Şêxo di berdewamiya hevpeyvîna xwe de anî ser ziman û got ku: Em dizanin gelê me yê Efrînê girêdayî axa xwe ye û di zûtirîn dem de dixwazin vegerin ser axa xwe. Herweha rewşa dorpêça ku ji milê hikûmeta Şamê vê li ser Helebê û Şehba tê meşandin her ku diçe giran tir dibe û gelê me yê ku li Şehbayê dimîne bi derfetên xwe û bi desteka rêvebera xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê dijî. Gelê me di serî de biryara berxwedanê û vegera bi romet ya Efrînê daye û wê heyanî dawiyê jî girêdayî vê yekê be. Di serî de mafê her welatiyekî Efrînê heye ku vegera ser ax, milk û malê xwe, lê dema ku Efrîn were rizgar kirin wê demê vegera bi romet û ya aram wê çêbibe. Lê di dema neha de rewş ne arame û rojane binpêkirin û kiryarên dij mirovî têne kin û kesên ku derbasî Efrînê dibin, têne girtin û işkence li wan tê kirin û li beramberî vê yekê jî tu dadgeh nînin ku mirov serlêdanê bike û mafê xwe bixwaze û were parastin.
Endamê Rêxistina Mafê Mirovan li Efrîn – Sûriyê Ibrahîm Şêxo di dawiya axaftina xwe de got ku: Pêwîste em kar û xebatê bikin û bi saziyên navnetewî re bikevin nave peywendiyê û hemû kiryarên dagirkeriyê yên ku têne kirin belge û teşîr bikin û bihêlin ku cîhan li ser rewşa heyî bisekne û dagirkeriya tirk di dadgehên navnetewî de were dadgeh kirin û di bin çavdêriya NY gelê Efrînê bi rengekî aram vegere ser axa xwe. Ji milekî din ve jî pêwîste ku hemû saziyên navnetewî bi erkê xwe yê axlaqî li beramberî gelê Efrînê rabin û çavê xwe ji kiryarên dij mirovî yên bê sînor ku li Efrînê têne kirin negre û dawî li dagirkeriya tirkiyê ji axa Sûriyê re pêkwere. Herweha ji bona ku hemû welatiyên Sûriyê vegerin ser axa xwe û hemû alî û kesên gunehbar werin dadgeh kirin.



## Salvegera 25'an a komployê

**Ahmet Aktaş**

Di 9ê Cotmeha 1998an da, êrîşa dijberî Rêber APO hat destpêkirin.
Erê weke planger dewleta tirk hat xuya kirin, lê biryara vê komployê, di asta pir bilind de hat standin.
Di serî de DYEyê û NATO heye, belê pir dewletên nasyar ên cîhanê, weke Rusya, Yunanistan, Israil, Misir û hwd. di vê projeyê de cih girtin. Gelo çima?
Ji ber ku êdî civakên cîhanê, bi siyasetên kevnar re, nikaribû bihatina birivîvirin. Hewcedarî bi dizaynek/sererastkirinek nuh hebû.
Ji bo ku derbasî serdemek nuh bibin û pergalên nuh saz bikin, divya kelemên pêşiya vê projeya xwe rakin.
Hegemonan, astengek herî mezin li ber pêşkeftina xwe û alternatif, felsefe û tevgêra azadiya gelê Kurdistanê didîtin.
Ji bo vê tevgêrê hilweşînin, her cûre êrîşên siyasî û leşkerî dan destpêkirin. Dîtin ku, heta Rêberê vê felsefê û tevgerê dîl negrin, nikarin vê tevgêrê bixin xizmeta xwe an jî hilweşînin.
Di encamê vê qenaetê de, 9'ê Cotmeha 1998an biryar dan ku êrîşî Rêber APO bikin. Û li pey vê biryarê hewldanên piralî meşandin, gelek dewlet kirin hevparê vê KOMPLOYÊ û di 15'ê Sibata 1999an de, li Kenyayê pêngava ewil pêkanîn; Rêbar APO dîl girtin.
Ji bo ku gelên cîhanê bixapînin, êdî dest bi her cûre amûrên siyaseta derewîn kirin. Bi navê demokrasiyê, azadiyê, mafên mirovan, bahara filan gelan û hwd. prapaganda meşandin.
Bi vê şêwazê, çendîn welat xistin nava şer, çendîn malwêranî pêkanîn û hîn jî dewam dikin, li ber çava ye.
Piştî mînakên Efxanistan û Iraqê, şer derbasî hemû Rojhilata Navîn û Efrîqayê bû. Nuha jî li Ukraynayê şer gihiştiye çi astê diyar e.
Bi kurtayî şerê cîhanî yê 3an, di rojevê de ye û hîn çendîn xeter li pêşiya gelan e "êdî xwedê zane"!
Piştî vê komployê û ewqas şer û xwînrijên li cîhanê, gelo li Kurdistanê çi bûn?
Pêşî divê ev were dîtin ku, îrade û dûrbîniya Rêber APO, rê li pêşiya van plangeran girt û ev komplo negihişt armanca xwe.
Bi filozofiya hemdemî pêşewazî li vê plangeriya ewqas mezin û berfireh kir. Bi hostayî û xweragiriyek demdirêj, bi afirandina stratejî û tektîkên nûjen, ne bi tenê komplo pûç kir û vala derxist, belê bi rêzanî û îradeyek mezin, mejiyê welatparêzên Kurdistanê rohnî kir û rê vekir. Tirs şikand, bi curetê xurt, gel û hevalên xwe dîsa rakir ser piya û ji berê xurtir tevger kir.
Kurt û kurmancî dubare hunerê rêveberiya xwe nîşanî dostan û dijminan da.
Li ser bingeha vî rûh û ronahiya ji Imraliyê rûda, li hemû Kurdistanê agirê şoreşê bilintir bû. Bi pêşengtiya jin û ciwanan, li Rojava şoreş pêkhat. Ev bayê şoreşê li Rojhilat, bi dirûşma JIN JIYAN AZADÎ bahoz rakir.
Niha ev ruhê ba û bahoza şoreşgerî, bandora xwe li cîhanê dike.
Ji ber ku hêzên komploger, ji hatina pêla giran a lehiyê ditirsin, li Imrali tecrîdê girantir dikin û li ser destkeftiyên Kurdistanê êrîşan zêdetir dikin.
Ev tê wateya; divê her Kurdistaniyên welathez, li hember van êrîşên plangeran, xwe hîn pirtir bi rêxistin bikin, Rêber û destkeftiyên xwe hîn zêdetir biparêzin!



# Komploya 9'ê otmehê pêvajoyeke girîng a şerê cîhanê yê sêyemîn e

Komploya Navneteweyî ku di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li dijî Tevgera Azadiyê, gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz de hate kirin, 9'ê Cotmeha sala 1998'an deŝt pê kir û heta niha berdewam e. Lê bi saya berxwedana dîrokî ya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê komplo negihişt armanca xwe.

**Mihemed Xanim /Qamişlo**

Hêzên sermayedarê cîhanî, serdest û dijminê civak û gelên bindest ji bo tesfiyekirina gelê Kurd û Tevgera Azadiya Kurd, hemû gelên azadîxwaz, tevger û kesayetên demokrat û sosyalîst di 9'ê Cotmeha 1998'an dli dijî Rêber Abdullah Ocalan Ocalan dest bi Komploya Navneteweyî kirin. Ji ber ku di hemû cîhanê de ji dost û dijminê gele Kurd û tevgerên azadiyê yê gelê Kurd re hate îspatkirin ku alternatîfa herî bi hêz ya sîstema demokratîk û azadiya gelên bindest projeya Rêber Apo ya konfederalîzma demokratik û siyaseta xeta sêyemîn e, sîstema modernîteya kaptalîzim û dewlet-netewe, hêzên serdest û hevkarên wan ji felsefeya Rêber Apo bi tirs bûn û ketin nava liv û tevgerê û cihê xwe di komploya navneteweyî de girtin.



### Despêkirina komployê

Fermandarê Hêzên Bejahiyê yê Artêşa Tirk a dagirker yê wê demê Atîlla Ateş di 18'ê Îlona 1998'an de bi awayekî eşkere gef li Sûriyeyê xwar û ji hikumeta Sûriyê xwest ku Rêber Apo ji Sûriyê bê derxistin. Her wiha Serokkomarê Tirkiyeyê yê demê Suleyman Demîrel jî li Parlamentoya Tirk bi heman awayî gef li Sûriyeyê xwar.
Dewleta Tirk bi piştgiriya Emerîka, Îsraîl û Brîtanyayê têkildarî Rêber Abdullah Ocalan gefa li ser Sûriyeyê zêdetir kirin. Di cîhana Ereban de jî serokê Misrê Husnî Mubarek ketibû dewrê. NATO û welatên Ewropayê jî bi heman mebestê ketibûn nav hewldanan. Dewleta Tirk 35 hezar leşker li ser sînorê Sûriyeyê bi cih kiribû. Di encam de Rêber Abdullah Ocalan biryara terkkirina Sûriyeyê da.

### Hêzên cihê xwe di nexşeya komployê de girtin

Bi awayekî rastersat DYE, Brîtanya, Îsraîl, Yewnanistan, Fransa, Hollanda, Rûsya, Elmanya, Kenya, û Misr tevlî nexşeya vê komployê bûn. Herwiha gelek hêz û tevgerên herêmê jî beşdarî komployê bûn.
Rêber Abdullah Ocalan derbarê destpêkirina komployê û rola Sûriyê wiha got: "Serokê DYE'yê Clinton ji bo derxistina min ji Sûriyeyê guftûgo bike, carekê li Şamê û cara din jî li Swîsreyê ji çar saetan zêdetir du civîn bi serokdewlet Hafiz Esed re pêk anîn. Hafiz Esed di wan hevdîtinan de li girîngiya mijarê hayedar bû. Ji bo xwe di cih de dît ku pêvajoyê dirêj bike. Ji bo demekê be jî ji min derketina ji Sûrî nexwest. Li dijî Tirkiyê dixwest min weke hêmaneke tewazunê heta dawiyê binirxîne. Lê min jî Sûriyeyê dahf dida ji bo bibe xwedî helwesteke stratejîk. Lê hêza min û rewşa min derfet û îmkan nedidan ku ez di vê de bi ser bikevim".
Rêber Abdullah Ocalan di axaftineke xwe ya li ser wê demê de ragihandibû ku li pêşiya wî du alternatîf hebûn; yek jê derketina serê çiyê, ya din jî çûyîna Ewropayê bû, wî jî çûyîna Ewropayê hilbijartiye ji ber ku xwestiye pirsgirêka Kurd bi rêya siyasî û diyalogê çareser bike. Rêber Abdullah Ocalan di 7'ê Cotmehê de bi Wezîrê Ragihandinê yê wê demê yê Yewnanîstanê Konstantînos Bantoûvas ê hat Sûriyeyê re hevdîtin kir. Konstantînos soz da ku li Yewnanîstanê ew ê alîkariya çareseriya pirsgirêkê bikin. Di vê dema ku ji bo sûîqestê jî rêxistinên îstîxbaratê dabûn dû Rêber Abdullah Ocalan ku cihê wî tespît bikin, mayîna Ocalan li Sûriyeyê bi giştî jî li Rojhilata Navîn zehmet bû.

### 9'ê Cotmeha 1998'an

Rêber Abdullah Ocalan di 9'ê Cotmeha sala 1998'an de ji Sûriyeyê derket. Bi bablafira Rêyên Hewayî yên Sûriyeyê çû Yewnanîstanê. Banteoûvas ê ku soz da Rêber Abdullah Ocalan diviyabû ew li balafirgehê pêşwazî bikira, lê li balafirgehê ew tinebû. Piştî ku daket balafirgeha Atînayê sozên ji Rêber Abdullah Ocalan re hat dayîn, bi cih nehat anîn. Rêber Abdullah Ocalan berê xwe da Moskowayê û 33 rojan li Rûsyayê ma. Di vê demê de Rêber Abdullah Ocalan daxwaza penaberiya siyasî li Rûsyayê kir. Di 4'ê Mijdarê de Meclîsa Dûma, 298 parlametneran pêşnûem biryara ji bo naskirina mafê penaberiya siyasî ya Rêber Abdullah Ocalan erê kirin. Lê belê li ser navê Wezîra Karên Derve ya DYA ya wê demê Madeleîne Albîrght berdevkê wê James Rûbîn daxuyaniyek da; nerazîbûn nîşanî vê da û diyar kir ku ew ê naskirina mafê penaberiyê ji aliyê ti welatî ve qebûl nekin. Serokwezîrê Rûsyayê Yevgenî Prîmakov destûr neda Rêber Abdullah Ocalan li Rûsyayê bimîne û jê xwestin, Rûsyayê biterikîne.

### Kurdên li Ewropayê herkîn Îtaliyayê

Rêber Abdullah Ocalan, li ser vê kompIoya ku Rûsya jî tevlî bû, berê xwe da Îtalyayê û di 12'ê Mijdara 1998'an bi balafirê derbasî Îtalyayê bû. Tevî ku Îtalyayê soz dabû jî, piştî ku Rêber Abdullah Ocalan hat nava xaka Îtalyayê, der heqê wî de biryara girtinê hat dayîn. Kurdên li Ewropayê jî herikîn Îtalyayê û xwedî li Rêber Abdullah Ocalan derketin. Kurdan li nêzî mala Rêber Abdullah Ocalan lê dima çalakiya rûniştinê pêk anîn. Mayîna Ocalan li Romayê êdî nepêkan bû. Piştî 66 rojan, di 16'ê Çileya 1999'an de ew ji Romayê derket û careke din berê xwe da Rûsyayê.
Ji kêliya ku Rêber Abdullah Ocalan hat û pê ve Rûsyayê dabû xuyakirin, ku ew ê wî qebûl neke. Biryar hatibû dayîn ku di ser Ermenîstan Karabagê re li Kurdistanê vegere. Lê belê dema li balafirê siwar bû, rêya balafirê bi awayekî derveyî kontrolê hat guhertin û ew li Duşanbe hat danîn. Di 26'ê Çileyê de jê xwestin ku wir jî biterikîne. Bi tenê rêyek li pêşiya Rêber Abdullah Ocalan mabû, ji nû ve li Yewnanîstanê vegere, bi balafireke ku hate kirêkirin ew li Balafirgeha Navneteweyî ya Atînayê peya bû. Lê destûr jê re nehat dayîn ji bo li Yewnanîstanê bimîne. Rêber Abdullah Ocalan vê carê çûyîna Hollanda weke pêşniyar pêşkêşî rayedaran kir, ji bo derkeve pêşberî dadgeha navneteweyî Hollanda hilbijartibû. Li gorî hatibû gotin wê balafirekê Rêber Abdullah Ocalan ji Atînayê bibira bajarê Rûsya Spî Mînsk û ji wir jî bi balafireke din biça Laheyê. Lê dema ew li Balafirgeha Mînskê peya bû, balafira wê pê biça Laheyê li holê nebû. Ji ber vê yekê ew neçar ma vegere Yewnanîstanê û ji ber zextê terikandina welêt lê hat kirin, vê carê bi heman balafirê ji Girava Korfû re hat şandin. Piştî wê berê Rêber Abdullah Ocalan dan welatên Afrîkayê.

### Çûyîna Afrîqiyayê

Di 2'ê Sibata de berê balafira Rêber Abdullah Ocalan dan Kenyayê. Rêber Abdullah Ocalan li Kenyayê li hemberî zextan li ber xwe dida. Tevî zextên Amerîkiyan û Yewnanîstanê jî Sefaretxaneya Bilind a Yewnan neterikand. Kenyayê di 15'ê Sibatê de xwest Rêber Abdullah Ocalan bê dersînorkirin. Bi şertê çûyîna Hollandayê terikandina avahiyê qebûl kir. Lê belê wesayîta ku ew dibir balafirgehê ji nişka ve ji nava konvoyê derket û winda bû.
Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê di 15'ê Sibata 1999'an de hat revandin û li Girtîgeha Yek Kesî ya Ewlekariya Bilind a Îmraliyê hat bicihkirin .Piştî ku ew li Girtîgeha Îmraliyê hat bicihirin, girav bi temamî weke herêma ewlekariya taybet hat îlanirin û tedbîrên awarte yên leşkerî hatin wergirtin.

### Armanca Komplogeran

Rêber Abdullah Ocalan derbarê armanca Komploya Navneteweyî de wiha dibêje: "Hêzên komploger PKK li hemberî Projeya Mezin a Rojhilata Navîn weke astengî didîtin. Lewma li hember PKK'ê û Rêberê wê êrîş dan destpêkirin."
Herwiha derbarê DYA wiha dibêje: ": Amerîka bi radestkirina min re feydeya ji Tirkiyeyê û çalakiyên li Rojhilata Navîn û Balkanan gihand lûtkeyê. Heman xisûs ji bo Îngîltereyê jî wiha ye. Îsraîl jî bi rola xwe ya di vê bûyerê de peywendiyên xwe yên stratejîk ên bi Tirkiyeyê re ispatkir."

### Rûyê rast yê NATO'yê

Rêber Ocalan wiha qala wan rojan dike: "Min rûyê rastî û veşartî yê NATO'yê di dema van seferan de dît. Di dema vegera ji Mînskê de ferman û alarma bîstûçar saetan dabûn ku balafir li ti balafirgeha welatekî Ewrûpayê danekeve. Em fêhm dikin ku di wê demê de ji bilî balafirgeha Mînskê ya dewleta bi tenê ya îsyankar Rûsya Spî balafirgeha welatekî din a destûrê bide daketina me nehiştibûn. Li cehennema Naîrobiyê sê rê li pêşiya min danîbûn: Ya yekê, bi sedema ku min demeke dirêj guh nedaye fermanê bi awayekî şiklî ez ê bihatama kuştin; ya diduyê, min ê yeka CIA'yê nekirana didu biketama bin fermana wê û teslîm bibûma; ya sisiyan, wê min radestî tîmên şerê taybet ên Tirk bikirina ku ev ji zû ve amade kiribûn."
Têkildarî tevlîkirina Yewnanistanê ya komployê jî Rêber Abdullah Ocalan wiha dibêjediyar: "Yewnanistanê beriya her tiştî fermana Emerîkayê anî cih".

### Pêvajoya Komployê

Rêber Ocalan pêvajoya komployê wiha dinirxîne: "Pêvajoya ji çar mehan a ji 9'ê Cotmeha 1998'an heta 15'ê Sibata 1999'an bi rengekî bêhempa derbas bûbû. Ji bilî hegemona cîhanê DYE, ti hêzê nikarîbû ev operasyona ji çar mehan di vê pêvajoyê de bikira. Rola hêzên şerê taybet ên Tirk (Serokê vê hêzê jî General Engîn Alan bû) di vê pêvajoyê de ew bû ku tenê min bi balafirê bigihîne Îmraliyê, ew jî veguhastineke bi kontrol bû. Ev pêvajo pêvajoyeek welê bû ku operasyona herî girîng a dîroka NATO'yê hate kirin. Ev yek ewqasî eşkere bû ku li her cihê diçû, kesî helweseteke dijber nîşan nedida. Yên ku nîşan didan jî yekser dihatin bêbandorkirin. Rûsya Mezin jî bi rengekî eşkere hatibû bêbandorkirin. Helwesta Yewnanan ji xwe têra vegotina her titşî dikir."

FENER



## Parastina axa Sûriyê peywirekî neteweyî û exlaqî ye

**Idrîs Henan**

Di van çend rojên bûrî de êrîşên dijwar li dijî binesazî û destkeftiyên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji aliyê faşîzma tirk ve pêkhat. Bi awayekî hovane, bi kîn û dijatiyeke bê sînor, li dijî sivîlan êrîşên qirkirinê pêk tên. Dijminê tirk hewl dide bi rêya van êrîşan ewlehiya li herêmê têk bibe û jiyana milyonê mirovan û têxe xeteriyê û vîna gelan bişkîne. Di heman demê de çi deriyekî istiqrara siyasî, aborî û ewleyî hebe, bigire û hemû derfetên jiyana azad û bi birûmet binoqîna gola dagirkeriya genî. Ji bo wê jî bike, bi hezaran hîncetan diafirîne. Dijatiya bê eslan jî wisa ye ku bi rêbaz û şêwazên dermirovî yên bê kok şerê te dike.
Ji wê jî xirabtir ew e ku; her kes bi maska mirovatiyê li bûyerên qirkirinê temaşe dike û weke latan jî bê deng dimînin.
Di heman dem û roja êrîşa li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, êrîşeke xedar bi ser akademiyeke leşkerî ve li parêzgeha Humsê pêk hat. Di encamê de zêdetirî 300 kesan, sivîl jî di nav de, (kuştî û birîndar) bûn mexdûrê vê kiryara terorîstane. Xuyaye ku jêdera plana êrîşan yek navend e ku xizmetî heman armanc û daxwaza dewleta tirk a dagirker dike. Hemû hêzên li ser erdê jî di ferqa wê yekê de ne, lê ji ber nexşeya berjewendîperest bê deng û bê helwest in. Bi gotinek din, rêdana ji êrîşan re, şirîkatiya li ser erdê ya fîlî ye.
Êdî rola tirkiyê ya li Sûriyê û mekanîzmaya dijatiya wê ya sîstematîk ji gelên wê re baş zelal bûye. Her dera vî welatî veguherandiye golên xwîn, kuştin, wêrankirin û guherîna domografîk û siyasetên koçberkirinê ferz dike. Eser û şopên kiryarên wê belî ne ku hewl dide di sedsaliya Lozanê de, li herêmê "Qibrisbûneke nû" bide tivîkirinê û axa Sûriyê û Îraqê parçe bike û du parçeyên din ên Kurdistanê bikiritîne. Vê dawiyê bi rêya itîfaqa nepenî û eşkere ya li ser plana li Dêrazorê hatibû destpêkirin, eşkere bû ku çendîn pirsgirêkên hêzên serdestiyê kûr dibin, ti carî bi gelan re li hev nakin. Rejîma li Sûriyê bi salan e li ber candanê ye, lê difin li jor girtiye û bi gelê Sûriyê re li hev nake. Berovajî wê yekê, dijatî û êrîşan hildibijêre û bi hêzên destwerdanê û dagirkeriyan re li dijî axa xwe ya neteweyî li hev dike û itîfaqan li pêş dixe. Tabloya li Dêrazorê qewimiye jî mînaka çors ya wê yek bû.
Îroj gelên Sûriyê divanka vê nêzîkatiyên desthilatdar didin û axa wan; parçe parçe, têye firotin û kiritandin. Lew re jî; êrîşên ku îro herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedef digirin, tenê gelên wê herêmê eleqedar nakin. Tevayî gelên li Sûriyê têkildar wê yekê ne. Çawa ku Sûriyê di maneya xwe ya cografî de, hebûneke neteweyî ya tevayî gelên Sûriyê ye, parastina wê jî erkeke neteweyî û şertekî welatparêziyê û yekparebûna axa Sûriyê ye.
Eger îro berxwedana li Bakur û Rohilatê Sûriyê weke mala giştî Sûriyê neyê hembêz kirin, eger hêzên demokrasiyê li Sûriyê nebin xwedî yek helwest û gotin û bi têkoşîna azadiyê re li dijî faşîzma tirk û çeteyên wê nebin yek blok, wê pêşeroja vî welatî şîlo be û dê kesek nikaribe ji bin barê wendabûna wê de derkeve. Îro jî parastina axa Sûriyê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê berpirsiyeriyek neteweyî û peywirekî exlaqî ya tevayî pêkhate û heyînên li Sûriyê ye. Ancax bi vê hişmendiyê dagirkeriya li Sûriyê têk biçe.